



*Serokê TOHAV'ê û parêzer Selim Okçuoğlu:*

## Dewleta nehênî jî êdî nikare rêveberiyê bike

Rûpel-3

Hevpeyvîn bi Pîr Rustem re:

Nivîskar divê pûtên  
forman bişikîne

Rûpel 8-9

Abdulwehab Bedirxan:

Bi cendekan serkeftin  
nayê pîvandin


Rûpel 4

Osman Özçelik:

Kî dibêje Tirkiye feqîr  
û lipaşmayî ye?

Rûpel-13





SAMI TAN

Kesên ku doza azadiya derbirina ramanê dikin, kesên ku jiholêrakirina çeteyan dixwazin û kesên ku li dijî xizaniyê derdikevin, divê bikevin milê tevgera azadîxwaz.

## Çete, xizanî û derbirina ramanan

Dewleta tirk dîsa ji bo ku xwe ji tengasiyê xilas bike, dest avêt çareseriyên derewîn. Wekî tê zanîn bi girtina Eşber Yağmurdereli, dewletê xwe xist nava tengasiyê mezîn. Heke mirov bi zimanê gelêf bibêje, qûş li xwe teng kir. Bi girtina Yağmurdereli re azadiya derbirina ramanê hate rojevê û nîqaşêke dorfireh dest pê kir. Rayedarên tirk ji bo ku rê li ber vê nîqaşê bigirin, efûkirina Yağmurdereli anî rojevê, lê Yağmurdereli helwesteke birûmet nîşan û rê li ber vê listikê girt.

Her wekî di nav gelê tirk de tê gotin, xap û lûçên osmaniyan naqedin. Îcar dozgerê tirk bi hinceta ku siheta wî nebaş e, cezayê Yağmurdereli taloq kir. Yağmurdereli piştî ku hate berdan ji helwesta xwe ya birûmet domand û da zanîn ku bi derketina wî pirsgirêka heyf çareser nebûye.

Li aliyê din girtina Yağmurdereli û salvegera bûyera Susurlukê li ser hev

hatin. Ev yek jî bû sedem ku çete û azadiya derbirinê bi hev re bîn nîqaşkirin. Hate dîtin ku dewleta li ber derbirina ramanan digire, bi ser çeteyan de naçe. Her wiha, diyar bû ku dijberên azadiya derbirina ramanê, bi çeteyan serbilind in; lê kesên ku li dijî çeteyan in, azadiya derbirinê dixwazin. Bi taybetî piştî daxuyaniyên Demirel, Yaşar Okuyan û Burhan Özfatura yên li dijî Eşber Yağmurdereli, derdorên faşist nerazîbûna xwe ji bo azadiya derbirina ramanan û piştewaniya xwe ji bo çeteyan diyarkirin.

Tiştêkî din ku her du kêşeyên li jor bi hev girê dide, bæguman kêşeya kurd û şerê qirêjî ye. Lewre piraniya kesên ku ji ber bîr û ramanên xwe hatine girtin, doza çareseriyê kêşeya kurd kirine, ji kurdan re azadî xwestine. Li hemberî vê yekê, dîsa piraniya kesên ku bi destê çeteyan hatine kuştin kurd û dostên kurdan in.

Digel rastiye divê ji bîr nebe ku,

lêçûnên şerê qirêjî her diçe li kedkarên tirk giran rûdine. Êdî serokê hikûmeta MGK'ê Mesut Yılmaz jî dibêje: "Ev zivistan wê ji bo xizanan bi zehmetî derbas bibe." Di destpêkê soz dan ku enflasyonê daxin ji sedî 50, lê ji niha ve enflasyon bûye ji sedî 93 û heta dawiyê salê wê ji sedî sed derbas bibe. Hin madeyên wekî tûpgaz, şeker û nan ku ji bo gel pêdiviyên bingehîn in, her meh, heta her hefte buhayê wan zêde dibe. Ew yek rewşa kedkaran xerabtir dike.

Her tişt bi şerê qirêjî ve hatiye girêdan. Çete hêza xwe ji şer digirin, rayedarên dewletê wekî sedema sereka ya girtina rewşebîran şer nîşan didin, wekî sedemeke mezîn a enflasyonê jî dîsa şer tê rojevê. Nexwe kesên ku doza azadiya derbirina ramanê dikin, kesên ku jiholêrakirina çeteyan dixwazin û kesên ku li dijî xizaniyê derdikevin, divê bikevin milê tevgera azadîxwaz a kurd û doza aştîyê birûmet û biratiyê bikin, da ku karibin azad û serbilind bişin.

## Ferhengok

<b>ajal:</b> sewal, heywan	<b>gengeşî:</b> nîqaş, gotûbêj
<b>amûr:</b> navgîn, hacet	<b>gewrî:</b> qirik (boğaz)
<b>astengî:</b> kend û kosp	<b>gufûgo:</b> gotûbêj (söyleşi)
<b>axaftin:</b> peyivîn, xebirdan	<b>havigeh:</b> xaniyê havinê
<b>baregeh:</b> kamp(üs)	<b>hempişe:</b> hevpişe
<b>baskorin:</b> bêhêzkirin	(meslektaş)
<b>bêhempa:</b> yekta, bêemsal	<b>hejahlî:</b> nirx
<b>beramberî:</b> hemberîhev	<b>hinocet:</b> bahane
(karşılık)	<b>jêhatin:</b> dahatû (gelir)
<b>bersûc:</b> sanik	<b>jinênigari:</b> biyografi
<b>bineçihbûn:</b> niştecihbûn	<b>kesayeti:</b> kesitî, şexsiyet
<b>bingeh:</b> hûm, temel	<b>kevnare:</b> antîk
<b>birdoz:</b> îdeolojî	<b>komelayeti:</b> civakî, sosyal
<b>bizdonek:</b> tirsonek	<b>komelkujî:</b> tevkujî, jenosîd
<b>bizmar:</b> mix	<b>lêhûrbûnî:</b> konsantre bûn
<b>cur bi cur:</b> celeb bi celeb	<b>livbazi:</b> çalakî(eylem)
<b>çavzûr:</b> awirtûj	<b>liwan:</b> poxan, koridor
<b>çepandin:</b> peyitandin,	<b>mafdar:</b> biheq
selmandin	<b>mihriçan:</b> festîval, fûar
<b>cil û berg:</b> kinc, timtêl	<b>nemaze:</b> bi taybetî (öze-likle)
<b>ochîmin:</b> seqîtin(geberme)	<b>nîgarîkirin:</b> neqîşandin
<b>dabag:</b> behs, qal	<b>nîşane:</b> remz, sembol
<b>dadgeh:</b> mehikeme	<b>pakrewan:</b> cangorî, şehîd
<b>danişin:</b> rûniştin (oturum)	<b>patereşk:</b> fateresk (dalak)
<b>darizandin:</b> mehikemekirin	<b>parezger:</b> wafî
<b>demîyan:</b> serdem, heyam	<b>penşan:</b> nesir
<b>derfet:</b> îmkân	<b>pîvan:</b> krîter (ölçüt)
<b>destûname:</b> bawername	<b>rêwîngî:</b> rêwîti (yolculuk)
(diploma)	<b>sinc:</b> rewîşt, ehlaq
<b>desthilatdarî:</b> serdestî, —	<b>sosret:</b> seyr, ecêb
rayedarî	<b>stûr:</b> qalîn
<b>dilsoz:</b> sadîk, biwîjdan	<b>sûlav:</b> çirav
<b>dîrav:</b> pere	<b>xedar:</b> giran
<b>dîrînde:</b> hov, wehş	
<b>dijberî:</b> zidî (karşılık)	
<b>endazyar:</b> muhendîs	
<b>etamîn:</b> neqş, çîn	
<b>erçen:</b> zeynî, çenge	
<b>firkîdî:</b> fondîpkirin	
<b>gengaz:</b> reng, pêkane,	
mimkûn	

## Gurbetelli

Bi salan e ku şerek li welatê kurdan didome, çapemeniya tirk di vî şerî de peywira propagandaya psikolojîk girtiye ser xwe. Lê hin caran kesên wekî MURAT ÇELİKKAN jî derdikevin, piştewaniya xwe ji bo aştî û biratiyê diyar dikin. Dema em kesên wisa dibînin bawerîya me bi wekhevî û biratiyê xurtir dibe. Bi vê bîr û baweriyê em vê nivîsa ku heftiyê çûyî di rojnameya GAZETE PAZAR de derketibû, li kurdî werdigerînin û pêşkêşî we dikin.

Dema ku min wergêrî yan rehberî ji bo heyetên navneteweyî yên cur bi cur dikir û min ew digerandin, min ew nas kir. Yekemîn gerîndeya giştî ya jin a rojnameyê bû. Di civînên bi vî rengî de ji aliyekî ve pirsên me dibersivandin ji aliyekî ve jî, tashîha dawî ya rûpelên ku dihatin ber wê çêdikir.

Çavên wê dibiriqîn. Di nêrînên wê de, ji aliyekî ve li gorî temenê xwe jan û giraniya rojên ku jiyabû û tiştên ku hatin serî hebû, ji aliyê din ve jî ronahiyeke hêvîdar û nûjen hebû.

Hempîşeya min bû. Lê diviyabû ku, pişeya xwe, li gorî hempîşeyên xwe di gelek şertên cihê de bi rê ve

bibe. Li rewşa nûçegihanên xwe yên ku li bajarên cihê hatine binçavkirin dipirsî, dixwest sedema girtina wan hîn bibe. Ew lê dixebitî ku astengiyên berbiçav ên ku li wan bajarên derdiketin pêşberî xebatkaran rojnameyê hîn bibe. Ango hişê wê tim li ser nûçegihanên xwe yên ku hatine windakirin an jî bûne qurbanê "faîlî meçhûl" an bû, bi bédengîyeke ku hêzê dide mirovan karê xwe dikir. Di sala 1963'an de hatibû dinyayê. Li Paloya Elezîzê hatibû dinyayê, pişt re li Fakûlteya Kimyayê ya Zanîngeha Çukurovayê wekî peywîrdarê Lêgerîne xebitîbû.

Di sala 1989'an de bi hinceta ku 'endamê PKK'ê'ye hatibû darizandin, ceza xwaribû û di sala 1993'yan de ji "bi şert" ji girtîgehê hatibû berdan.

Dema ku ji girtîgehê derket di Rojnameya Özgür Gündemê de xebitî. Pişt re jî bû gerîndeyê giştî yê ve rojnameyê.

Di 10'ê berfanbara 1993'yan de polisên avêtin ser rojnameyê. Ew roj, "Rojê Mafên Mirovan a Navneteweyî" bû. Hemû kesên ku di avahiya rojnameyê de bûn hatin girtin. Gurbetelli û 17 hevalên wê di bin çav de hiştin. Di 23'ê berfanbarê de ew derxistin dadgehê, li dadgehê wekî endama rêxistinê hate girtin û ew şandin Girtîgeha Bayrampaşayê. Di encama darizandinê de ji endamtiya rêxistinê 3 sal û 9 meh ceza girt.



Roja 2'ye sermawezê min di rojnameya Gündemê de nûçeyê li ser wê ku "şehîd ketiye" xwend. Piştî ku ji girtîgehê derketiye ketiye nav refê "gerîla" û di rojên derbasbûyî de li "Kurdîstana Başûr" şehîd ketiye.

34 salî ye. Wê tim 34 salî bimîne. Mîna sembola bi hezaran ciwanên ku "şer" û mirin bûye para wan, wê di mejiyê me de be. Wekî bi hezaran ciwanên ku welatên wan ji wan re bûye xurbet.

Li welatêkî ku ji bo Gurbetelli nemirin em nikarin tiştêkî bikin, sistemeke ku "tevahiya segan tene berdan û tevahiya kevîran tene girêdan", wekî şermiya çeteyan, bertîlan, bê hiqûqiyên wê tim bê bibîranîn.



Serokê TOHAV'ê û parêzer Selim Okçuoğlu:

# Dewleta nehênî jî êdî nikare rêveberiyê bike

"Dewlet bi çapemeniya xwe bi birjuwaziya xwe di her warî de cih digire. Rojnameya Hürriyetê di manşetê de nivîsî; "Belgeya dîrokî" wekî ku ji bo gel pir bi xêr û baş e. Dewleta nehênî ev e, her kes baskekî vê dewletê ye. Lihevkirineke mezin heye çapemenî jî di nav vê de ye."

Toreya Osmaniyan ji leşkerên tirk re mîrate maye. Li gorî lêkolîner û çavkaniyan ev kevneşopî di dema III. Selim de di salên 1989'an de dest pê dike. Ji bo ku tesîra şoreşa Fransayê li ser neteweyên di bin bandora Osmaniyan de pêk neyê III. Selim komîteyeke veşarî ku ji 24 kesan pêk tê, ava dike. Ev komîte jî rêxistineke sîxuriyê (ajan) ava dike, li gorî ku agahiyên sîxur tînin komîte biryaran digire û wan biryaran jî bi riya celadan (çeteyên îro) pêk tîne. Piştî 1859'an îcar leşker beşdarî vê komîteyê dibin û ev kevneşopî heta roja îro carna bi darbeyan, carna jî bi îqazan û carna jî bi derxistina zagonên veşarî ve xwe dide der.

Piştî 12'yê rezberê ku PKK dest bi şerê çekdarî kir, îcar rengê darbeyan guherî. Di destpêka salên 90'î de leşkeran careke din bi awayekî eşkere dest danî ser hikûmetê. Her çiqas parlamento û serokomar li ser kar bin jî her tim li gorî biryaran ku ji MGK'ê derdikevin, meclîsa tirk tevdigere û bêyî ku ew biryar di meclîsê de bê nîqaşkirinê tê pejirandin. Di 31'ê kewçêrê de di MGK'ê civînekê pêk anî. Di dawiya civînê de bi navê MGSB, yanê "Belgeya Siyasetê ya Konseya Ewlekariyê" belgeyeke ku naveroka wê nayê zanîn, lê divê her kes riyayê wê bike, di çapemeniyê de cih girt.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan jî di bernameyeke MED-TV'yê de daxuyand ku MGK li Tirkiyeyê hêza sereke ye, saziyên din û partî vîtrînî ne. Di sa hin derûdorên siyasî jî dinirxînin ku MGK bi vê belgeya siyasetê dixwaze di hin waran de restorasyonê pêk bîne, ev jî tê wateya hin partî wê bêne tasfiyekirin. Di nav van de RP û HADEP'ê jî cih digirin.

Li ser vê belgeya siyasetê ya MGK me hin pirs arasteyî Cîgirê Serokê CHP'ê Sinan Yerlikaya û parêzer Ali Riza Dizdar û Serokê TOHAV'ê Selim Okçuoğlu kirin.

Serokê TOHAV'ê û Selim Okçuoğlu bal kişandê ser veşarîbûna dewleta nehênî û eşkerebûna rûyê wê yê îro. Wî daxuyand ku bi vê bûyera dawîn dewleta veşarî xwe eşkere kiriye, ev eşkerebûn jî nîşan dide ku êdî dewleta nehênî an jî veşarî

ri nikare êdî pîrsgirêkên Tirkiyeyê çareser bike. Veşarîbûna belgeya siyasetê jî encama vê yekê ye. Li Tirkiyeyê ev eşkere bû ku hêza herî mezin di bin perdeya demokrasîyê de MGK ye. Rayeya (yetkî) MGK di warê çand, huner, siyaset û hwd. di ser hemû hêzan re ye. Okçuoğlu wiha axivî: "Ev belgeya siyasî jixweber dernekete holê, dewletê hêzên faşîst û paşverû heta dawiyê bi kar anîn û îro wan wekî tehdît dibîne. Bi hemû îmkanên xwe bi hemû hêzên xwe êdî dewleta nehênî ketiye nav buhranekê, li sistemeke rêveberiyê digere. Ev belge jî îsbata wê ye." Okçuoğlu bal kişandê ser beçarebûna dewleta nehênî û daxuyand ku li Tirkiyeyê çar pîrsgirêkên bingehîn hene, ya sereke jî pîrsgirêka kurdî ye. Heke dewlet vê pîrsgirêkê di demeke kurt de çareser neke aloziyeke mezin li derî ye. Di vê bingehê de MGK dixwaze pisgirêka Kibrisê û ya kurdî çareser bike. Di sa dewleta nehênî dixwaze îslama rêxistî û siyasî jî holê rake.

Okçuoğlu li ser helwesta çapemeniya tirk jî sekînî û wiha axivî: "Dewlet wisa bi gotinekê jî sê çar kesan pêk nayê. Bi çapemeniya xwe bi birjuwaziya xwe di her warî de cih digire. Rojnameya Hürriyetê di manşetê de nivîsî; "Belgeya dîrokî" wekî ku ji bo gel pir bi xêr û baş e. Dewleta nehênî ev e, her kes baskekî vê dewletê ye. Lihevkirineke mezin heye çapemenî jî di nav vê de ye. Divê em li vê bûyerê pir ecêbmayî nemînin, di her sistemî de rûyê dewletê yê eşkere û yê veşarî heye, lê li Tirkiyeyê ev zêdetir xwe derdixe pêş."

## Ez ançax dikarim fikra xwe bibêjim

Li ser vê siyasetnameya MGK'ê Cîgirê Serokê CHP Sinan Yerlikaya berê pêşîn fikrên xwe yê şexsî gotin, pişt re jî li ser navê partiyê axivî. Yerlikaya dide zanîn ku CHP'yî her tim dixwazin ku Tirkiyeyê bibê komareke hiqûqî û civakî. Heke hêzeke ku li hemberî hiqûqê û civakeke sosyal hebe, ew vê yekê qebûl nakin. Sinan Yerlikaya wiha axivî: "MGK hêzeke



di ser meclîsê re ye, biryaran ku ew distînin ne hiqûqî ne, ez bi xwe wekî şexs li hemberî vê yekê me. Lê partiya me wê li hemberî vê yekê derkeve an dernekeve ez nikarim tiştekî bibêjim, ji ber ku raye di destê serokê me de ye." Li ser pîrsa me ya heta "vê gavê MGK'ê çî biryar hilda bêyî ku di meclîsê de bê nîqaşkirin, derbas bû, lê Serokê we Deniz Baykal got: "Emê li hemberî vê belgeya siyasetê derkevin" hûn jî vê yekê re çî dibêjin?", jî Yerlikaya da zanîn ku MGK saziyeke hiqûqî ye, lê mafê wê yê qanûn çêkirinê nîn e, lewre jî partiya wan ji berê ve li hemberî tiştên bi vî rengî bûye.

## Ev cûnta ye

Me li parêzer Ali Riza Dizdar jî pîrseke wiha kir: "Gelo MGK dikare belgeyên siyasetê çêbike, yanê qanûnê derbixe, desthilatdariya MGK'ê çiqas li ser TBMM'ê heye?" Ali Riza Dizdar bi awayekî pir zelal diyar kir ku di ser meclîsê re hêz nayê qebûl kirin, heke hêz hebe wê gavê ew rêveberiyê cûntayê. Di rêveberiya cûntayê de jî hêza serdest çawa bixwaze wisa dike û îro li Tirkiyeyê bûyereke bi vî rengî heye. Dizdar wiha axivî: "Ev hêz di her warî de xwe derdixe pêş; di warê aborî de, di warê civakî de biryaran hildide, belgeyên siyasetê derdixe û biryaran digire û bi rê ve dibe. Ev jî nîşan dide ku hêza sereke MGK ye, yê heyî vîtrînî ne." Dizdar bal kişandê ser mijara derxistina qanûnan jî û daxuyand ku meclîsên gel qanûna bingehîn çêdikin, wan diavêjine girtîgehan, lê ew jî bo ku cûntaya wan bidome qanûnan jî çêdikin.

NAVENDA NÜÇEYAN

## 800 gund vala kirin

Serokê Belediyeya Dêrsimê Mazlum Aslan, îfade da "Komîsyona Lêkolîna Pîrsgirêkên Koçberiyê" ku di bin TBMM'ê de karê xwe dimeşîne û da zanîn ku ambargoya xwarinê hê jî, li ser bajêr heye û perwerdehî nayê kirin. Wî diyar ku li dorhêla Dêrsimê 3 qereqol hene û wiha got: "Lê gava ku ew nikaribin ewlehiya 3-4 mamosteyan bikin ev xetere ye. Serokê belediyeya Dêrsimê got ku heta niha bêtirî 800 gund û mezrayên Dêrsimê jî hêla hêzên dewletê ve hatine valakirin.

## Greva birçîbûnê

Piştî 10 hezar girtiyên siyasî, ku 9'ê sermawezê jî bo protestokirina sistema hucreyan ketibûn greva birçîbûnê; 1500 girtiyên ku ji dozên adlî li Girtîgeha Bayrampasaya Stenbolê radizên jî bo piştgiriya girtiyên siyasî û "Daraza serbixwe" biryara greva birçîbûnê girtin. Hezar pênçsed girtî bi telefonên xwe yê berîkê, li saziyên wekî ÇHD, Halkın Hukuk Bürosu, İHD û li çapemeniyên cur bi cur geriyar û dane zanîn ku endamên çeteyan yek bi yek tene berdan, lê ji ber ku li pişt wan dewlet tune ye bi salan ew di girtîgehan de dimînin.

## Ismail Beşikçi

Li gorî daxuyaniya Ünsal Öztürk û parêzer Levent Kanat, sosyolog û nivîskar İsmail Beşikçi jî temenê xwe 15 sal 4 meh û 25 roj li girtîgehan derbas kiriye. Öztürk û Kanat dane zanîn ku roja 13'ê sermawezê roja çar saliya girtina Beşikçi ye. Beşikçi cara yekemîn 19'ê pûşpera 1971'ê de li SBF'yê hatibû binçavkirin. Heta niha derheqê 35 pirtûkên wî de 105 doz hatine vekirin. Di daxuyaniyê de hat gotin ku heta Beşikçi di zindanê de be, ne bi tenê li Tirkiyeyê, li seranserê cihanê kes nikare xwe azad bîhesibîne.

## "Terorîstên aştiyê"

Ji İtalyayê Dîno Frisullo û ji Almanyayê 6 kesên ku ji bo "Trêna Aştiyê a Musa Anter" hatibûn Tirkiyeyê jî bo ku beşdarî darizandina dadgehê bibin hatin Tirkiyeyê û daxuyaniyeke çapemeniyê dan. Di daxuyaniyê de tê gotin ku, ew jî bo ku bibin alîkarê daxwaza aştiyê ya sed hezaran hatine Tirkiyeyê, lê dewleta tirk bi panzer, tanq û topên xwe li hemberî vê yekê sekiniye û ew wekî "terorîstên aştiyê" nîşan dane. Lewre jî ew îro hatine ku xwe biparêzin.



# Bi hejmara cendekan serkeftin nayê pîvandî

Ev nivîs ji hêla Abdullwehab Bedirxan ve hatiye nivîsandî û li El-Heyata roja 12'yê gulana 1997'an hatiye weşandin. Nivîs ji hêla FENER ROJBIYANÎ ve li kurdî hatiye wergerandin. Tevî ku dîroka wê derbas bûye jî, nivîsê ji hejahiya xwe tiştê wînda nekiriye, lewre jî me ev nivîs hejrayî weşandinê dît.

**I**ro hejmara kuştîyên kurd çend e? Hezar, du hezar, sê hezar?... Operasyona komara tirk li başûrê Kurdistanê, "serkeftin li pey serkeftinê" bi dest dixe. Divê neviyên Ataturk ê mezin serî bi wan "serkeftinan" hildin.

Pîvana serkeftinê jî cendek û kelexên kurdan in. Li vir hejmar dipeyivîn, yekî ku bi vî şeweyî hiş û mejiyê xwe bi kar bîne, pêwîst e ku xwediyê hiş û mejiyekî seqet be. Çima na, bo çî wisa neke, eger ew her roj bahozekê ji çêbike û Amerîka piştgiriya wê bike û bibêje: "Wan bikuje, gelek bikuje, kesî jî wan nehêle..."

Dîsa divê ew hiş, ew mejiyê hanê yê tirkan be, ji ber ku bawerîya wî hişî her tim, bi vî tevkuştinê Tirkiye dikare çareseriyekê digel kurdên xwe pêk bîne. Lê tirk nizanin, ku li şûna kurdên li nav xwe de, kar bike û bi wan re bixebite û wan bike beşek ji teşeya civakî, bi vî hişî, bi vî ramanê roj bi roj kurdan hê zêdetir dike kurd, wan zêdetir dike dildarê serxwebûnê.

## Bawerîya generalan pir bi Barzanî tê

Bawerîya general tirk ên "demokrat" bi serokwezîrê wan Erbakan nayê. Lewma ew amadehiyên xwe yên ji bo vî operasyonê jî wî veşartin, lê belê, di şûna wî de, hemû baweriyên xwe xistin nav şal û şepikên kesek ku diviyabû bibe "pêşeweyekî kurd", bi vî hawî Mesûd Barzanî, da çespandin ku ew cih û xwedî vî baweriyê ye, lê ev tenê ne bes bû, ew gelek ji sînorê xwe dûr çû.

Wî gelek xebat û keftelefte "bê-hempa" kir, da ku wan erk û delametên ku xistine destê wî bi cih bîne. Mîna her noker û xayînekî xwe sîparte dijmin, wîjdan, xwe firote neyarên bav û kalan. Di dema rejî-

ma Bexdayê de, destvala û tu derfet di destî wî de nemabûn, ta ku tevkuştin, enfal, kîmyabaran li ser kurdan berdewam bike, tiştên bincil, sercil bûn, di wê demê de. Wî "pêşew"ê bêhêvî xwe da pêş, berdestî û xizmetên xwe pêşkêşî rejîma Iraqê kirin û bi dagirkirina Hewlêrê xwe diyar kir û ew nûtrupal ma. Li hêla din dema Enqereyê pîrsa leşkerkirina Mesûd Barzanî ji bo berjewendiyên xwe anî cih, êdî Enqere

PKK'ê li Hewlêrê, Dihokê û hin deverên din, divê demê de "pêşewa" ji havîngeha xwe xêrhatina artêşa serleşkerên tirk dida û bûya rêzan û alîkarê wan li herême di bin destê wî de. Di kurdemekê de "niştimanperwerî" û "malmezîni" mîvantiya ji bo PKK'ê bû feq û xefkeke reş, em li nûçeyên şerê di navbera hêzên her du partiyan de temaşe bikin, emê bibînin ku çiqas şer dirinde û tund

helwesteke kor û ker û lal.

## Xiyantkariya dîrokî

Ev ne cara yekemîn e ku kurdên Iraqê bi piştgiriya Tirkiyeyê bi çek û silahên giran, şer dikin beramberî kurdên Tirkiyeyê, lê belê ev cara yekemîn e ku bi xwîneke ew qas sar, ev xwîna han tê rijandin. Xwînmijiyên wiha ku bi viyan û giyanekê xinîz pêk hatine gelek hindik in, lê eger em navê xiyantkariyê lê bikin, "pêşeweyê" me Mesûd Barzanî kete nava dîrokê. Ji deriyê "dijî terorê" bi heman terorê û reşkujiyê, lê bi wêne yên pîs û xerab û bi awaya Îsrailê, yê ku ew li ser destê wan fêr bûbû, bi şeweyên tirkan, bi şewe û riyên Sedam... û bi vî hawî, êdî divê "pêşewe" bibe xwedî sipasnameyekê amerîkî.

Îro tiştê herî balkêş û diltezê divê bûyerê de, kuştin ji bo ne kuştinê ye, ne kêr, ne zêde.

## Gelê kurd li pişt Abdullah Öcalan e

Tirkiye îro êdî, baş dizane ku ev tevkuştin, ne di paşerojê de bi kêr hat, wê ne jî di pêşerojê de bi kêr were. Enqere bixwaze nexwaze pîrsgirêka kurdî li pêşiya wê ye, ne li pişt wê ye. Di nava sînor de ye, ne li derve ye. Bila Enqere tu carî serî hilnede jor, bi hejmara cendekan. Enqere eger vî rastiyê ji gelê xwe re îtîraf neke jî, Abdullah Öcalan serok û sembolek e ji gelê kurd re û ew gel wê her tim li pey wî biçe. Têkçûn-ne têkçûna Öcalan e ku di pêkanîna serxwebûnê de ye, lê belê têkçûna Tirkiyeyê ye. Ji ber ku rejîma Enqereyê rejîmeke newêrek û tirsonek e, newêre bê û li ser maseya aştiyê digel nûneritiya gelê kurd guftûgoyên aştiyê bike.

Mîna heş gav PKK û serokatiya wê banga aştiyê radigihîne û li şûna ku rayedarên tirk dest bi danûstandinên aştiyê bikin, ji ber wê tîrsa hanê, Enqereyê siyasetek ji xwe re pejirandibû, ku bihêlin A. Öcalan bibe mîna destekê ji dewletên cîran re. Em dikarin bibêjin ku hiş û mejiyê tirkan ta roja îro nekariye çareseriyekê siyasî ji pîrseke hundîrîn re biafrîne, lê ew hişê din, hiş û mejiyê amerîkî yê ronak, em giş û têr dizanin ku ew hiş û mejiyê amerîkî ji bilî çekfirotin û piştgiriya enfal û tevkuştinê, dikare gelek tiştan bike.



Ev ne cara yekemîn e ku kurdên Iraqê bi piştgiriya Tirkiyeyê bi çek û silahên giran, beramberî kurdên Tirkiyeyê şer dikin, lê belê ev cara yekemîn e ku bi xwîneke ew qas sar, ev xwîna han tê rijandin, eger em navê xiyantkariyê lê bikin, "pêşeweyê" me Mesûd Barzanî kete nava dîrokê

ne hewcedar e, ku ew bi xwe bi wan karên kirêt rabe, karên kîret yên ku "pêşeweyê" me bi kurdan dike, dijminê mezin Tirkiye, nikare bike, ew kurdan dikuje da ku "serokatî" û pêşewetiya xwe li ser ev gelê reben xurt bike, lê ev çî "serokatî û pêşewetî" ye? Êdî her tişt êşkere bû, êdî ewantiya wî di nav gel de bûye riswatiyek mezin jê re.

Operasyona komara tirk berî roja ragihandina şer, bi çend rojan dest pê kiribû. Dema hêzên Barzanî êriş kirin ser navend û baregehên

derbas dibê. Ev yek jî bes e ji bo ku ew şer bibe cihê şermezariyê. Tiştê herî pîs û xerab, ji pênûsa yê ku wêkî "Parêzgerê Hewlêrê" tê binavkirin hate der. Wî zîlamî bi rûreşiyek terî wî belavokek derxistibû. Tê de piştewaniya tevkuştina hêzên Barzanî ya li Hewlêrê tê zimên; hemû dîl hatine kuştin, destdirêjî li jinan kirine. Ev piçek ji agahiyên şer in, lê mixabin kes ranehişte pênûsê û ev belavoka han derewîn derxist an şermezar kir. Mixabin rojnamenivîs, rêxistinên siyasî li ser bînpêkirina mafên mirovan bûne xwedî



# NÇM stûneke çanda kurdî ye

Sazî û rêxistin stûnên jiyana gelan in, gelê ku dixwaze li ser piyan bi awayekî xurt bimîne, divê saziyên xwe ava bike û xwe rêxistî bike. Gelê kurd bi geşedana tevgera azadiyê ev rastî ditiye. Lewre jî gelek saziyên kurdan pêk hatine. Navenda Çanda Mezopotamyayê yek ji van saziyan e.

Ev saziya neteweyî bi xebatên xwe gihanê dide çand û hunera kurdî, wan xurt dike. Ev yek bi qasî ku dibe sedema piştevaniya gelê kurd jî vê saziyê re, dibe sedema rik û kîna dijminên kurdayetiye jî. Lewre jî destpêkê heta roja îro, êrişên li ser NÇM'ê kêm nebûn. Bi dehan xebatkarên wê hatin girtin û îşkence li wan hate kirin, ji bo ku rê li ber xebatên wê bê girtin, çî ji destê rayedarên dewletê dihat xwe jê nedan paş.

Lê van êrişan nikaribûn li ber geşedana çalakiyên NÇM'ê bibin asteng, dara ku li Stenbolê aj da, şaxên xwe gihandin; Amed, İzmir, Mêrsîn, Edene, Hewlêr û Silêmaniyê. Roja 25'ê mehê jî bi beşdariya sê hezar kesî şaxa Rihayê vebû, bi vê yekê re êrişên hêzên dewletê jî gurtir bûn. Di heman rojê de hêzên dewletê avêtin ser vê şaxê, 15 kes binçav kirin, lê dîsa jî piştevaniya gel kêm nebû, li ser vê yekê bi biryara waliyê Rihayê, di 8'ê meha sermawezê de deriyê şaxa Rihayê hate morkirin.

Piştî êrişê li ser şaxa Rihayê, cerd û êriş li ser hev hatin; di 2'yê meha sermawezê de, berî ku şanoya "Rojbaş" dest pê bike, îcar polisan avêtin ser şaxa Mêrsînê. Li vir jî hemû şanoger û serokê şaxê Servet Özkan hatin binçavkirin. Piştî re jî bi hincetên komîk Servet Özkan û şanoger Kemal Ulusoy girtin û şandin girtîgeh.

Her wekî di destpêkê de jî hate diyarkirin, gir û kîna talanker û dizên çanda kurdî li hemberî kurdayetiye ye. Ew jî xwe saz kirina kurdan, ji rêxistîbûna wan, ji duristbûna şanogeriya kurdî, ji pêşketina zimanê kurdî ditirsin. Lewre jî saziyeke ku tê du sed heb muzîkvan, sed heb şanoger û sed govendgir hebin ji bo wan dijmin e. Li aliyê din heke wê saziyê perwerdehiya çar sed zarokî jî girtibe ser xwe û di ser de kovareke çand û hunerî derxe, sûcê wê zêdetir dibe.

Ji ber ku qanûnên vê dewletê jî rê nadin cezakirina xebatkarên saziyeke bi vî rengî, biryar cezakirina wê di civînanê nehênî de tê girtin. Lewre rîya xebatkarên saziyên wisa zêde bi dadgehan nakeve, karê bicihanîna biryarên nehênî li ser milê polisan û hêzên nehênî ye.

Lê divê bê gotin ku dozger û dadger jî dema, alîkarî pêwîst be xwe ji vê yekê nadin alî. Her wekî di girtina Kemal

Ulusoy û Servet Özkan de xuya dibe, ew hemû rêz û rêçikên hiqûqî didin bin piyan. Dozger û dadgerên ku hîç bi kurdî nizanin li ser daxwaza polisan di lisikên xwerû bi kurdî de hemanên sûc dibînin û bi vê hincetê mirovan digirin diavêjin girtîgehê.

Ji pratîka sалан a tevgera azadiyê diyar e ku ew êrişên li derveyî mirovî û hiqûqê li ber geşedana çalakiyên saziyên neteweyî nabin asteng. Gelê kurd êdî hew destûrê dide ku çand, huner û zimanê wî bê pişaf-tin. Dûr an jî nêzik, dê rojekê her kes vê yekê fêhm bike, tevgera azadiyê vê yekê bi wan dide fêhmkirin.



SERWISA ÇANDÊ

## Bedcanê Tîmurleng

MEDENÎ FERHO



Lucien Febvre, di her deh salên dawî yê temenê xwe de dîtinê avête meydanê û got: "Dîrok, zanistiya şûnewarî û zanistiya îro ye." Ev dîtin bû çavkanîyek ji ya Fernand Braudel re ku digot: "Dîrok, diyalektîka berdevam e." Her du dîtin, li hemberî bûyer û pêhatiyên dîrokî nixên hişyarbûnê nîşan didin. Ji ber ku lîstikvanên bêdeng bargiraniya jiyana berdevam û tîr mirovanî li ser milên xwe dikin, havên di meya ava jiyane de ku li lewleba keyandinê bi rêkûpêk radigirin, pêk tînin. Cîhan û mirovahî deyndarê mirovên wilo ne, ne ku deyndarê kerdizên Asya Navîn û Tîmurleng in.

Di sînorê şelq û pêlên demjiyanên dîrokî de pir şaşî hatine kirin. Êdî belge û destnivîs tu rê nadin şik û gumarî ku kerdizê Asya Navîn Tîmurleng, modela dîroka tirkan e. Çiqasî Tîmur moxol be, çiqasî jî seriyan mînare çekiribin, erd û ax bi xwîne av dabîn, mirovekî jî miroviyê dîr be, zarokên di pêçekê de kişûmat kuştibin, ayîngeh, dêr û wargehên olî wêran kiribin jî, bûye model ji

tirkan re. Bêguman ev mijar, pêdiviya guftûgoyê di hêla zanistiya civakî de derdixe hemberî me. Lê, nîşaneyên matematîkî yê dubareyî ku zext û îşkên bazirganî di nava xwe de radigirin hene. Ku rê li ber vê çendê digirin. Lewre dîroka şermezariyê bûye lewleba kewna jîndariyê. Wîlo bêxelat!... Wîlo bê wate.

Pêr, duh ronî dike, duh îro ronî dike. Xefk û dafikên pêr û duh şax û perên xwe digihînin roja me. Da ku bedcanê Tîmurlengê kerdiz, şerkêşîya şerê têrçirêj û gemaî li Kurdistanê dike, gihaye wê qonaxa piştî kuştina kalên heştê salî, serjêkirina mirovan û kuştina zarokan, destdirêjiyê li dêr û ayîngehên olî dikin.

Ev mirovê jî mirovaniyê der, modela dîroka tirkan e ku ji xwe re dikine bav û kal. Di vî şerê têrçirêj û gemaî de, hêzên tirkan dest bi wêranî û girtin û qedexekirina fêrbûna zimanê zîmkarî olî ya çar pirtûk xiristiyanan kirine. Xwediyê mîrata Tîmurlengê kerdiz rayedar û fermanarên dewleta tirk bi eynî tîmtêlê nêzikî gelên di nava sînorên xwe de dibin. Ayînxanên mîna Xorî Azîz Gunel ku suryanî bi giştî kirin tirk û di vê hêlê de pirtûk nivîsîne jî rayedar û fermanarên tirkan dilaram nekirine. Bila heya êvarî Mark Bloch bibêje: "Dolaba jiyane bê rawestandî dizivire" xem nake. Dîrok, civata bûyerên cîhanê ne ku pitirpêr, pêr duh, îro, sibe û disibe doktrînen wê civatê ne û dabaşa van demjiyanan bi dorfirehî tê axaftin. Pir balkêş

e ku şaşî û çewtiyên tirkan ew e ku tenê hêlekê, yekê bi tenê, li gorî xwe beşekî dibijêrin û cîhanê, gelên cîhanê bi giştî tirk berdîdin û dîroka xwe jî li ser vê çendê ava dikin. Ev jî wan di nava doktrîna wan de dixeniqîne. Di nava teqena dîroka bê çehrê de dijîn.

Dîrok jî di nav de, zanistiyan mirovaniyê tev ji hevûdin sûtê digirin. Bi eynî zimanî diaxivin, yan jî dikarin biaxivin: Ya tirkan tenê cuda ye. Dema li xîşê wan hat her kes tirk e, dema li xîşê wan nehat her kes dijmin e, xayîn e. Serhişkîya tirkan û maceraperesîya wan talanî û kujerî ye.

Ayînxanekî ola xiristiyanî, (keşe) li ser Tîmurlengê kerdiz û hatina wî ya Tur-ûl Abidîn 100 helbest bi tîpên suryanî, lê bi zimanê kurdî nivîsibûn. Helbest destnivîs in û bi xêzikên pîrr delal hatine nivîsandin. Her helbest li ser rojê ku Tîmurlengê kerdiz li xaka Mezopotamya maye, hatiye nivîsandin. Naveroka van helbestan li ser serhişkî, kujerî, talankeriyê ye. Sala 1977'an dema ayînxanê ola Xiristiyanî (keşe) ev helbest dixwendin, hêstîrên ziwa dibarandin. Dawî ev got: "Bedcanê wîlo, dem deman dişirivin û di şopa xwe re rêwîngiyê dikin. Tîrsa min ew e ku demjiyaneke wiha bi ser me de bê." Gotîna ayînxanê ola Xiristiyanî (keşe) derkete holê.

Bedcanê Tîmurlengê kerdiz, li xaka Kurdistan û Mezopotamya digere.



# Keça Kurdistanê ya serbilind

Bi livbaziya te dagirker şaş û metel man. Ji ber ku qet nedipa û bêhesab û plan mabûn. Careke din ji nû ve mêtîngerên tirk darbeyeke mezin xwarin. Ji hêlêke din ve jî, rêça hevala Zîlan hate domandin û geş bû. Keçên Kurdistanê bi egîftiya wê hişyar bûn û her roj rê li pêşiya koletiyê tê girtin û deriyê azadiyê tê vekirin.

**K**eça Kurdistanê di dîrokê de heya roja me ya îroyîn hatiye, xwe bi du awayî daye nîşan. Yek a serbilind e, yek jî ya kole ye. Ya berê tim û tim di bin bandora serdestiya mêran, çînen serdest û mêtîngeran de dijiya. Ew jiyan jiyanêke zor, dijwar û koletî bû. Di wê jiyane de rûmeta keça kurd tunebû û ji hemû mafên azadiyê û yên mirovahiye dîr ketibû û bêpar mabû. Lê bi rêberiya bîrdoza tevgera azadiyê ew rewşa koletiyê li ser keça kurd hate rakirin û jiyanêke zelal ji bo keça kurd derket holê. Bi ronahiya bîrdoza wê tevgerê roj bi roj keça kurd serbilind bû. Îro li hemberî edet û toreyên feodal, malbatî, jiyanê koletî û pergala mêtînger keça kurd her dem serbilind e. Ev jî dihêlê ku keçên Kurdistanê yên azad û serbilind wekî Dîbistan Perîşan xwe bidin nîşan.

Belê keça kurd Dîbistan Perîşan, kesayetiya berê ya dijmin û kesayetiya îro ya partiyê ji hev dîr xistin, her

perçeyek bi derekê de çûye. Te hîm birîna hezar salan a neyar êşand û him jî ji hevûdin belav kir. Dilê tirsonek di nava civakê de dibêjin: "Hey wax!" û dilê wan hat hejandin. Ji aliyê din ve jî hene ku li ber te dikevin. Lê ew, ew qas ne girîng e. Ya girîng ew e ku dilê gelê kurd hate dagirtin. Dilê Kurdistanê jî bi te pir kêfxweş bû. Dilê partiya te jî hêj bi giyana şer germ bû. Her kes bi te serbilind bû. Ji ber ku tu bi xwe serbilind î. Bi vî awayî serbilindiya te bû ya me hemûyan. Tu xwediyê jiyanê azad î. Ji ber wê te xwe kir jiyan û li her derê, di dilê her kesî de tu jiyayî.

Erê hevala Dîbistan Perîşan, qet tu dilê xwe neêşîne. Armanç û livbaziya te pêk hat û wê hê jî pêk were. Ne mêtîngeran û ne ji rojnamevanan karibûn dengê te yê bilind û livbaziya te biçûk bikin û veşêrin. Ji ber ku gelê kurd û tirk çavê wan li te bû. Şopa te li ber çavê wan winda nedibû. Hêviya yekîtiya her du gelan vejîn bû.

Yekîtiya kurd û tirkan ava dibû. Sîxûr û neyar pir bi tirs û xof didin derdora xwe. Ji ber ku mirina wan nêzik dibe, zilma wan ji zêde dibe. Bendên dîrokî bi lehengiya şoreşgerî ji holê radibin. Armançên neyaran ji holê tîn rakirin. Livbaziya te, hemû pergala mêtîngerê tirk hejand û tirsêkî mezin di nav wan de çekir.

Hevala Dîbistan, bi rastî mirov nîzane bi kîjan dilan jiyanê te bîne zimên. Lê mirov dikare bi vî awayî biryar bide û binivîsîne. Hinek be jî, pêwîst e ku were nivîsandin. Riya te riya azadiyê ye. Domandina armanca te, serkeftina me ye. Bi vî awayî Mezopotamya wê sosyalîzma zanistî baştir dinase. Bîranîna te ya din jî, her roj her dem û her nefes bê jiyandin, tu di dil û ramanê me de yî hevala Dîbistan. Mirov wê bi dilê te yê germ bijîn. Yê ku te bi bîra xwe bînin wê bijîn. Li ser vê bingehe girêdana mirovan bi şehîdan ve tê avakirin. Ev girêdan û bîranîna hêzeke mezin e ji bo me hemûyan.

Dibe ku gelek pirsên li ser negihîştina hedefa xwe ya livbaziya te jî bînin mirov. Lê rastiyek îro heye. Her mirovêkî ku di bin fikr û ramana serokatiyê de mezin bûye, jiyayê her dem ji xwe dipirse û ji dijminê xwe mafê xwe û mafê gelê xwe dixwaze. Berî çalakiya tolhildanê lêgerîneke mezin li ser çêdike û heyânî dikare pêk tîne. Tu ji bi vê ramanê mezin bûyî. Piştî derketina te ji nava malbata Kurdistanê û şûn ve, te her dem amadekariya xwe ji bo livbaziyeke lehengî dikir. Ji bo vê yekê ne gengaz bû ku te jiyanê bê livbazî bipejiranda. Hemû daxwaziye te, çalakiye te ji bo armançên mezin pêk dihatin. Livbaziya te di dem û wextêkî pir girîng de çêbû. Hemû xort û keçên Kurdistanê wê li şer şopa te û Zîlanan bimeşin. Her gelekî wekî gelê kurd jî bi pakrewan digihêje azadiya xwe.



Her pakrewanek jî dîrokê dewlemend dike. Civakê nûn dike û bi hevûdu ve girê dide û bi yekcarî derbasî jiyanê û rêxistinê dike.

Ji bo vê dema nû serokatî wiha dibêje: "Her rojêke me derbasî dîrokê dibe." Livbaziya te û kesayetiya te jî derbasî dîrokê dibe. Dilsoziya te hişt ku tu xwe bigihîni vî bajarî û dengê şoreşê li wir bilind biki. Veqetîna te ji çiyayên serbilind ên Kurdistanê, li Başûr û herêma Amedê, ne hêsan bû. Lê te ew rengên livbaziyan derbasî bajarê Tirkiyeyê kirin. Şerê ku îro hatiya damezirandin bi rêberiya serokatiyê û partiyê tê domandin, te giranbuhaya vî şerî zanibû. Ji ber vê yekê dilê te pir xurt bû ku tu bigihîji vî bajarî.

Bi livbaziya te, dagirker şaş û metel man. Ji ber ku qet nedipa û bêhesab û plan mabûn. Careke din ji nû ve mêtîngerên tirk darbeyeke mezin xwarin.

Ji hêlêke din ve jî, rêça hevala Zîlan hate domandin û geş bû. Keçên Kurdistanê bi egîftiya wê hişyar bûn û her roj rê li pêşiya koletiyê tê girtin û deriyê azadiyê tê vekirin. Keça kurd cihê xwe di nava şoreşê de digire. Ev hemû jî dihêlê ku keça serbilind, keça şoreşger derkeve holê. Di welatê Kurdistanê de û bi rêberiya PKK ê wê şoreşê bimeşînin. Tiştê giranbuhaya ku mirov karibe mînak bigire ji bo kesayetiyeke serbilind ev e, xelasi jî ev e.

EHMED BAYRAM

Îxanet,  
Xencera bi mora osmanî  
neqîşandî ye

ku di ber piştê

Îdrîsî Bedlîsiyê

Bi şal û şepik de ye

Avzûma zêrîn, polayê

Bi xwîna avdayî ye

Îxanet!

Berpêşkirina serê çil hezar

kurdî ye, ji Sultan Selîm re

Xencera di berfê de çikandî

Xwîna hişkbûyî

Bedena zuwa, mejiyê

belawela, dilê ku tê perçekirin

û welatê ku tê piçûparîkirin e

Îxanet!



Hevala Gurbertelli Ersöz tu yê her tim di dilê me de  
wekî fermanzarekê bijî!

**LI SER NAVÊ XEBATKARÊN  
NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA,  
SEROKA GIŞTÎ NURAY ŞEN**



□ 20 sermawez 1994:

Rojnameya hefteyî Welatê Me ku xwerî bi kurdî weşan dikir li Stenbolê dest bi weşanê kir. Rojnameya ku bi zaravayên kurmançî, soranî û dimilkî weşan dikir bi rêkûpêkî 46 hejmar hate weşandin. Hejmara dawî ya rojnameyê 1'ê kewçêra 1995'an derket. Xwedîya rojnameyê Aynur Bozkurt bû. Mazhar Günbat heta hejmara 35'an gerîndeyê giştî bû, piştî vê hejmarê Mehmet Gemsiz ev kar kir. Her wiha heta hejmara 10'an Mehmet Gemsiz, ji hejmara 11'an heta dawiyê Metin Aksoy berpirsiyariya karê nivîsaran a rojnameyê kir. Ji bo hejmarên 4,5,6'an ên Welatê Me doz hate vekirin.

## BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 18 sermawez 1937

Seyîd Rîza û hevalên wî hatin darvekirin. Seyîd Rîza di sala 1862'an de, li herêma Dêrsimê hatiye dinyayê. Di sala 1937'an de serokatiyê serkêşiyê serhildana Dêrsimê kir. Bi bêbextî hate girtin û ew birin Elezîzê. Li dadgeha leşkerî tevî hevalên xwe hate darizandin û 60 sal berê îro hatin darvekirin. Li gorî nivîskarê îslamî Necip Fazil Kısaklırek di dema Serhildana Dêrsimê de 55-60 hezar kes hatine kuştin. Her wiha Seyîd Rîza bîyê destûra mehkemê, bi biryara İhsan Sabri Çağlayangil ku wê demê waf bû hate darvekirin.

# Mihrîcana pirtûkan



**G**elek kesan pirtûkên bi dilê xwe standin, gelek kesan jî ji TÛYAP'ê bi tûrikên vala derketin. Hin kesan jî bi şeweyekî weşarî ku xwendekar jê re dibêjin "desteserkirin", pirtûk bi dest xistin. Li gorî xwediyê weşanxaneyan ji ber sedemên nebûna derfetên madî, ew pirtûkan desteser dikin. Ji aliyê din ve xwendekar jî, ji weşanxaneyan zêde memnûn xuya nakin. Ji ber ku weşanxaneyan îsal standên pirtûkan pir xurt parastin. Li gorî weşankar Ayşe Nur Zarakolu, îsal, pirtûkdizan jî wekî par û pêrêr ji dil û can xwe nedan karê dizîna pirtûkan!

Di fuara pirtûkan a 16'an de pirtûkên ku ji layê dîtarî ve bala her kesî dikişandin hebûn. Lê weşanxaneyên ku pirtûkên kurdî çap kirine, gelek kêmtir bûn. Li gorî Ayşe Nur Zarakolu nebûna weşanxaneyê wekî Avestayê ku weşanên bi kurdî çap dike, kêmasiyeke mezin e. Zarakolu bi şewazekî rexneyî diyar dike ku weşanxaneyên ku pirtûkên kurdî çap dikin jî zêde li serê nesekînin. Li aliyê din di warê firotina pirtûkan de, li gorî Zarakolu, potansiyela giştî ciwan in. Ew jî bi zêdeyî pirtûkên politîk distînin.

Her wiha Zarakolu di warê kêmasiya çalakiyên li TÛYAP'ê de jî gazinên xwe dike û wiha dibêje: "TÛYAP hemû derfetên pêşkeşî me dike. Lê em çalakiyê hêja li vê TÛYAP'ê nikarin li dar bixin. Me çalakiyê li ser azadiya ramanan li dar xist, 15 kes beşdar bûn. Reklama çalakiya têr nayê kirin û yekîtiyê di navbera me de tune ye". Zarakolu diyar dike ku, weşanxaneyên kurdî jî divê di navbera xwe de yekîtiyê çêbikin da ku bi xurtî beşdarî fûarê bibin.

Carinan di standên weşanxaneyan de em li pirtûkan ku ji aliyê dewletê ve hatine qedexekirin jî rast dihatin. Lê bi giştî weşanxaneyên ku li TÛYAP'ê cih ji xwe re negirtibûn, yên ku pirtûkên wan hatine qedexekirin bûn. Weşankaran dan zanîn ku, xwendekaran bi giştî pirtûkên ku doz li wan hatine vekirin an jî pirtûkên ku hatine qedexekirin, xwestine.

**Weşanxaneyan çi firotin.**

**Sosyal:** Mîtoloji-Felsefe û metafîzîk, (ji firotina pirtûka memnûn e).

**Pencere:** Umut Zileli, Oral Çalışlar û Suna Aras. (firotin îsal ji par hê kêmtir e).

**İletişim:** Roman, lêgerin û lêkolîn, (ji firotinê memnûn e).

**Can:** Roman, (ji firotina pirtûkan memnûn e).

**Kitab-î Mukades:** Bi 296 ziman û zaravayan weşanên wan hene. İncala kurdî baş hatiye firotin, lê ji firotinê ne memnûn e.

**Oda:** Roman, (her sê rojên paşîn firotina pirtûka baş bûye).

**Berfin:** Hemû pirtûkên wê tîr firotin, ji firotina pirtûkan memnûn e.

**Çivi Yazıları:** Firotina pirtûkan baş nabîne. Di rojên înzeya de pirtûk hinekî zêde hatine firotin. Bi giştî ciwanan pirtûka Çe kirine.

**Sol:** Firotina pirtûkan îsal ji salên din baştir e.

**Kaynak:** Bi giştî firotina pirtûkan baş e. Lê pirtûkên ku hatine qedexekirin, bêhtir tîr pirsîn. Wekî din jî pirtûkên zarokan jî îsal baş tîr firotan.

AZADIYA WELAT / STENBOL

## ÇAVDÊRÎ

Zimanên ku heta îro jiyane, ji komelkujiyê rizgar bûne



AMED TÎGRÎS

**H**er ku diçe li ser jiyana, çand û zimanê gelên kevnare lêkolînên hêja derdikevin holê. Di van salên dawî de, du lêkolîner û lêgerînerên Îngilîz Peter Bellwood û Colin Renfrew encamên xebatên xwe yê hêja ji çapemeniyê re dan diyarkirin. Encama xebatên wan gelek întresant û seyr e. Vê encamê gelek teoriyên kevn ên li ser zimanê dema destpêkê xistin nav gumanan û hinek teoriyên ku dihatin pêşkêşkirin jî rastiya wan xurtir kir. Peter Bellwood û Colin Renfrew, bi awayekî kurt encama lêkolîn û lêhûrbûnên xwe wiha dan diyar kirin:

"... Di dawiyê dema qeşayî (buzul devrî) de, di dîroka mirovahiyê de şoreşeke çandî ya mezin pêk hat. Di dema gelek kurt de, li Asya, Ewropa û Afrîkayê bi deh hezaran ziman ji holê rabûn. Ew ziman ji rewşeke zindî ketin rewşeke mirî."

Ji destpêkê heta îro ji wan zimanên kevn li gorî texmînan 16 heb mane. Du lêkolînerên Îngilîz vê yekê dibêjin:

"Sedemên windabûn û mirina ziman gelek hêsan e. Ew zimanên ku wê demê komên gel pê dipeyivîn, îro ji wan re dibêjin; Îndo-Ewropî, Tirkî, Samî û Sîno-Tîbetî. Di dema destpêkê de, tu ziman jî yê din pêşkêşîr nebû; lê bi destpêka çandî û ajal xwedîkirinê re hinek ziman jî, bi pêş ketin. Bi taybetî li cihên ku çandî û ajalxwedîkirin li wir dest pê kir, ziman jî bi xebat û encama berhemên çandiniyê ve bi pêş ketin.

Hejmara wan deh car zêde bû, bi awayekî nedîr xurt bûn. Ew bi axê ve hatin girêdan û bi cih bûn. Civatên wê demê ji bo ku bikaribin xwe li hemberî şer û êrîşên dagirkeran biparêzin, xwe bi rêxistin kirin.

Wan di dema gelek kurt de, bi darê zorê Ewropa, Asya û Afrîka dagir kirin. Di dawiyê de li herêmên cuda gelek ziman di bin bandora zimanên pêşkêşî de man û zimanê wan jî navê rabûn û bûn zimanê mirî. Di bûyerên sosyolojîk de, ji vê bûyerê re komelkujîya zimên tê gotin..."

Mirov di encama vê lêkolîn û lêhûrbûnê de, ji careke din kevmarî û dewlemendiya zimanê kurdî baş dibîne. Heta niha bi deh hezaran ziman li ser rûyê dinyayê winda bûne an jî hatine windakirin. Lê zimanê kurdî jî hezar salan ve bêdewlet, bêtorîyeyên siyasî, civakî û kulturî bi hemû rengên dagirkerî, qedexekirin û helandinê heta niha bi awayekî xurt û jîndar maye.

Li gorî vê teoriya Peter Bellwood û Colin Renfrew gelo zimanê kurdî jî bi darê zorê gelek zimanên din ji navê rakirine an na? Heger bersiv belê be; gelo çend ziman ji navê rakirine an jî kuştine? Ji ber ku ev her du zanar dibêjin: "Gelên ku binecîh bûn, dest bi çandî û ajalxwedîkirinê kirin, ziman û çanda wan jî pê re bi pêş ketin û di dema kurt de bandor li ser zimanê gelên din kirin û bi awayekî komelkujî bi hezaran ziman ji navê rakirin." Wekî tê zanîn gelê kurd jî gelên binecîh ên kevntîr ên Mezopotamyayê yek e. Bi rastî hîn îro jî mirov dema di warê çandî û ajalxwedîkirinê de, li zimanê kurdî dinêre, gelek dewlemend e. Mirov dikare bêje ku di vî warî de bêhempa ye. Lê belê, ji tûnêna dewlet û desthilatdariyê, di sedsalên dawî de, di warê îndustrî, ekonomî, rêxistinî, komelayeti û ziman de jî gelê kurd gelek li paş maye, li paş hatiye hiştin û xistin.

**Serastkirin:** Di nivîsa Amed Tigrîs a bi navê "Sedemên tîkçûna dewletê çi ne?" de, ku di Azadiya Welat hejmara 92'yan de derçû, di şûna "2330" salî berî niha de "20-30" sal berî niha" hatiye nivîsandin. Ji ber vê çewtiyê em lêbora xwe ji Amed Tigrîs û xwendevanên xwe dixwazin.



Çiroknivîs Pîr Rustem

## Nivîskar divê pûtên



HEVPEYVÎN: HELÎM YÛSIV

Ez jê dipirsim: Pîr Rustem kî ye?

□ Belkî yek kare bibêje ku, du pirtûkên wî ên kurteçirokan hene "Çivîkên Beravêrî" di sala 1992'yan de hate weşandin û a diduwan "Pîlindir" di sala 1993'an de hate weşandin û her du jî ji weşanên kovara Aso ne. Digel gelek çirokên ku di kovar û rojnameyên kurdî yên mîna Aso, Armanc, Stêr, Jiyana Rewşen, Azadiya Welat, Pirs û Zanîne de hatine weşan

Belkî ê destpêkê de navê te bi çirokê ve hatiye girêdan, kêma nivîskar hene ku navê wan bi celebê hunerî ve tenê tê girêdan, çima çirok?

✓ Ji bêhtengiyê. Bi nihêrîneke fireh û gelemperî bê gotin, çî bêhtengiya civak û rewşa ku kurd tê de dijîn, li aliyekî û li aliyê din bêhtengiya min û kesîti. Belkî ên ku bi min re dijîn dijberî vî tiştî di min de dibînin, lê ev wêne encameke ji bandora politîk li ser kesayetiya min e. Ji ber ku, bi me dabûn fêhmkirin ku divê em her yek Eyûb pêxemberek bin.

Lê dîsa ezê li pîrsê vegerim, çima çirok?

✓ Bi dîtina zanîna psîkolojiyê, di hundirê mirov de du hêz li hemberî hev dilivin. Jiyan û mirin û nivîsandina hêza jiyane ye ku, nivîskar dixwaze pê hêza mirinê basko bike. Di zarokiya me her yekî de kanî hene, kesayetî û pêşerojê nîgar dikin. Di zarokiya min de jî, di wan heşt salên ku, min li gundê Çeqela derbas kirine de, kesekî navsal û çirokbêj cihêkî kûr û mezin di hestê minî veşartî de digire. Piştî ku min çirok ji wî digirtin û di roja din de, min zarokên di salên xwe de li dora xwe dicivandin û çirok li gorî zanîna û hestê xwe û bi rengekî nû ji wan re digot.

Piştî ku, me barî Cîndîrê kir, kaniyek fireh û dewlementir li ber min vebû. Ez di wê demê û bi riya bavê xwe rastî kesekî hatim. Pirtûkên Wezaretê Çandî ya Sûriyê dihatin cem û wî jî li kesên dixwazin bixwînin belav dikirin. Wî kir ku ez di deh saliya xwe de û heya bi şeş-heft salên di pişt re jî nivîskarên mezin bixwînim û nemaze ên rûsî (Soviyeta berê), mîna Çexov, Tolstoy, Lërmentov û hin çirokên polîsî mîna ên A. Crîstî

Di dawiyê de mîna ku, nivîskarê Argentinî ê mezin Liwîs Borksis dibêje:

"Ev millet nikare efsaneyek ji du rûpelan bawer bike, çawa ku ji sed rûpelî be." Lê dîsan jî eger ku, hinekî rewşa min a kesîti jî vê sipehîtir be, ezê ber bi romanê ve biçûma û ez' diçim.

Gelek carî xwendevan di çirokên te nagihêjin. Têkiliya di navbera nivîskar û xwendevanan de tu çawa dinirxîni?

✓ Eleksendir Solejenîstîn dibêje: "Nivîsandin tîpên reş in û li ser pelegekî hatine belavkirin, lê zanîna xwendinê ne bes e ku tu karibî wan bixwîni." Di destpêkê de xwendevanê zimanê kurdî (nemaze zaravayê kurmançî), xwendevanê elfabê ye. Ev jî pir se-

demên wê hene, em ne di wê pîrsê de ne û demek dîv û dirêj tê xwestin û piştî avakirina pir bingehan, heya ku, xwendevanê me yî hunerê bê holê. Lê heya ku, ev xwendevan jî hebe, dîsa jî wê nikaribe bêxwendinek rexneyî bigihêje radeyê nivîsarê diduwan. Di vir de rola yê rexnegir tê xwestin. Bi nêrîneke metemetîk, du xelek in û dîvî hev in, nivîskar-xwendevan û heya ku her du zevî-xelek bi hev ve bîrêdan, divê xeleka yê rexnegir bikeve nava wan.

Zimanê çirokên te zimanekî herêmî ye, gelek peyv û pevokên girtî di çirokên te de cih digirin, ev astengiyekê



KURTEJIYAN: PÎR RUSTEM KÎ YE?

Di 4.3.1963'an de, mîna her zarokêkî birçî, tazî li ser dengê giriyê xwe, çavan li ser sîlavên ronahiyê vedike. Li gundê Çeqela ji herêma Efrînê ji dayîka xwe dibe.

Heşt salên pêşîn li gund derbas dike û pişt re mala xwe bar dikin Cîndîrê. Destûrnameya (dîploma) xwedina lîse distîne û jî bo ku destûrnameya xwendina bilind di zanîngeha bajarê Helebê de bistîne, çend salên dawî li wir dimîne. Pişt re dikeve zanîngehê û li beşa endazyariyê dixwîne, lê berî ku destûrnameyê bistîne û piştî ku digihe rêza çaran dev jê berdide.



# Form û dibistananan bişikîne

er peleke spî hatine belavkirin, lê zanîna xwendinê ne bes e ku tu karibî wan bixwînî.”  
 Ewê ye. Ji ber pir sedemên dûv û dirêj tê xwestin ku, xwendevanên me yî hunerê bê holê.  
 Ewê ye. Divê rêz û rêçikên wê hebin, lê gerek ev rêz û rêçik nebin pûteke pîroz. Ji ber ku ziman berhe-  
 gorî vê yekê û wekî ku, ziman hatiye naskirin; ew kana dilgermiyê ye.

*balkêş e?*

✓ Berî her tiştî divê em zanibin ku, ziman ne bes gotinên ferhengî û rêzimanî ye. Erê ew şeweyê danûstandinê ye û divê rêz û rêçikên wê hebin, lê gerek ev rêz û rêçik nebin tabû. Ji ber ku, ziman berhemeke dîrokî, demkî ye ne ebedî ye. Li gor vê yekê û wekî ku, ziman hatiye naskirin; ew kana dilgermiyê ye. Têkiliyê di navbera nemaziyê û gelemperiyê de zindî ye. Ev yek dihêle ku, ziman di pêvajoyeke dûvdirêj re derbas dibe û li ser yek rejimê namîne. Eger ku herêmiya min ji hin gotinan siwarkirina hin pevokan tê nixandî, ev ne sûcê min e. Eger ku em razî bin an na, em lawên herêma xwe ne. Û zaravayê herêma Efrînê, eger ku em nav lê bikin zarava ji zaravayên kurmançiya jorîn e. Ji bilî Efrînê li Xerbot û Riha û Meraşê tê bilêvkirin. Lê dîsan ji ne rêdaneke ku wekî ziman li Efrînê tê bilêvkirin, yek pê binivîse. Û eger ku wilo be wê hingê astengiyek heye.

Lê ji min ji nayê xwestin ku, gotineke kurmançî û heya ku bingeha wê soranî be jî û di zaravayê Efrînê de tê bilêvkirin, mîna gotina “bisekin”, divê ez gotina “raweste” bi kar bînim, çima? Eger ku li pişt wê ne meseleyên din bask-kinê bin.

Em kurd bi gelemperî bindest in û kurdên Başûrê Biçûk, yek dikare bibêje bindestên perçeyên Kurdistanê ên din in. Vêca divê em kurdên Efrînê bindestên Cezîrê bin jî û wilo divê me efrînî bin-bindest bin.

*Zimanê çirokê bingeha çirokê ye, tu jî dûrî zimanê gelemperî dikevi, gelo ku her yek li zaravayê herêma xwe xwedî derkeve û guh nede zaravayên herêmine din wê rewşa zimanê kurdî çawa bibe?*

✓ Ji pirsê te bêhna sückirina min, di nivîsandinê de, dide ber çavan. Ango em pevoka (pirsa) te wilo bixwînî: Zimanê çirokê bingeha çirokê ye û ji ber ku zimanê te herêmî ye û ev yeka jî astengiyek e, lewra çiroka te ketiye xefika astengiyê. Ne xem e ka em bibêjin eger ku, zaravayê Efrînê zimanekî taybetî be, mîna çî zimanên cihanê, wê hingê ev çirok di astengiyê de ye an na?

Ez naxwazim berxwedana xwe bikim. Lê eger ku zimanê min herêmî ye ku bi zimanê ku, ez aniha pê diaxivim, bi diya xwe re biaxivim wê çî ji min fêhm bike, ne tiştêkî. Lê eger ku em bixwazin astengiyê deynin ber xwe û li çareyekê bigerin, emê bibînin ku astengiya rast heyîna xwe ji zaravên ku pê tê nivîsandin distîne. Çî kurmançî, soranî û dimilî û hwd. astengiya me ji vir tê. Û li gorî nêrîna min, du rê û tecrûbe li ber me ne, yek riya ku miletên ereb (min got miletên ereb û ne miletê ereb) û eşîr û zaravayên wan ku, di bin bandor û sîka Quranê de bûn, yek milet û yek ziman, an jî tecrûbe li ber me ne, yek riya ku miletên Ewrûpayê ku, çawa ji zimanê latînî ew qas zimanên ewrûpî bi derketin. Lewre dîr nabînim ku, rojekê di rûpelên dîrokê de, mîna van pevokan bînin nivîsandin û miletê kurmançî û miletê soranî û hwd. û her yek ji wan bibexwedî rejîm, ziman û çandeyekê cihê.

*Teknîka çiroka te tevî hev e, tu azadiyê didî hest û mejî û destê xwe, ku tu sînor ji forma çirokê re nayê holê?*

✓ Eger ku tu ji min bixwazi, huner bi gotinekê bidim zanîm, ezê bêjim azadî û dînbûn e. Ango azadî, dînbûn, huner di zeviya zanîne de yek merama wan heye. Dr. Xalîde Seîd dînbûnê wilo dide nasîn: “Nişana wê yekê ye ku her kesek dixwaze azad bijî û xwe ji bindestîya sînc û ramanên yekreng azad bike.” Dînbûn sîrgûnî ye, civaka te ber bi devê şûşe tê vedide, û ev dema a bêhnçikandinê ye.

Berî her tiştî nivîskar ne kesereke siruştî ye. Li gorî dîtina Sigmund Freud: Kesê nivîskar dixwaze xeyal û xewnên xwe ên torekî (cînsî) bi rengêkî ku, milet bi çavêkî li wan binihêre, derxîne. Lewre ew dibêze nivîsandinê û xwe li ser spî- pelan tazî dike. Mirov di jiyana xwe de, carekê xwe tazî dike; dema ku, ew û pîrek li hev dicivîn. Lê kesê nivîskar, careke din xwe bi pelê spî re tazî dike.

Eger ku, em vegerin dibistanên rexneyî, emê bibînin ku, her tim nivîsandin hebû û li gorî wê dibistaneke rexneyî ava bûye. Ango wê bi form tunebin ku, em kirasê pîrozîyê bi ser de berdin. “Mihemed” pêxember bingeha ola îslam



mîyetê danî, roja ku kete hundirê Qabeyê û pûtên Qureysîyan şikêndin. Nivîskar ji divê pûtên form û dibistanan bişikîne ku, karibe berhema xwe, ola xwe derîne holê. Tu karî bibêji ku, nivîsandin ceribandî e.

*Di van çend salên dawî de çiroka kurdî li başûrê biçûk radişe ser lingan, çiroka pêvajoya me jî gelekî qels e, gelo ev astengiyê an na?*

✓ Na, ev ne astengi ye. Ji ber ku asteng di zanîna xwe yî ferhengî de xendek û gewriya ku, du golên avê (dengîz) digihîne hev, ango fetisandin e. Li gor vê zanîna me ji gotina asteng re, ka em li pêvajoya çiroka kurdî binihêrin. Emê bibînin ku, ev celebê nivîsandinê li cem me kurda nû ye. Erê belkî yek derkeve û bibêje berî niha jî çiroka kurdî hebû, lê ne li gorî çiroka nûjen e. Lewre em nikarin nav li wan bikin, çirok li gorî naskirina me yî îro jî çirok e.

Rewşa pexşan û çiroka kurdî li ser destê çend bavan, wekî “Çexov, Mebosan, E.A Bo” hatiye bingehkirin û ne tiştêkî veşartî ye ku, yek bibêje encamêk ji encamên şaristaniya alavê ye. Piştî ku mirov xiste bin bandora xwe û di devê şûşe de dîl girt. Vê yekê hişt ku li şeweyekî nû bigere û xwe ji kemandê wê azad bike. Şeweyek li gorî dema mirovê îro ku, tê de dijî, li gorî bêhtengiya wî.

Arnold Taynbee dibêje: “Milet ne di demên hêsan de bi pêş dikevin, li dijî

vê yekê, ew di demên zor û teng de ber bi pêş ve diçin.” Vêca li gorî vê nêrîne em dikarin bêjin ku çiroka kurdî wê gavên fireh di demên kin de bavêje.

*Nivîskarên kurd li Başûrê Biçûk di rewşeke xerab de ne, ne rojnamegerî li ser hev e, ne tu pencereyên vekirî hene û zimanê kurdî jî qedexe ye, di vê rewşê de, pêşeroj xwe bi çî awayî pêşkêş dike?*

✓ Astenga nivîskarê kurd parek e ji astengiya gelemperî ya ku miletê me tê de dijî. Di roja îro de şerê heyîna miletê kurd bêhtirî her demeke berê te kirin, di herêman Kurdistanê seranser de. Lê dîrok tiştêkî balkêş dide ber çavên me ku, kurd di demên xerab de, di fikrên dîrokî de heyîna xwe dertîne holê.

Lê mixabin, xuya ye ev dema dûvdirêj ji bindestiyê heştê psîkolojiya kurdan bê guhartin û bibê ye kesekî kole û eger ku tu wî kesî azad bikî, ewê berî her tiştî xwe bide kuştin. Tecrûba kurdên me yê Bakur li ber çavan e. Lê di Başûrê Biçûk de, mesela me hîn xerabtir e, ji bilî van tiştên ku, te gotine eger ku, rewşa tevgera polîtîk li ser hev be, wê meydaneke hêviyê li pêş me be. Dîsa jî eger ku, yek li tabloya çiroka kurdên Başûrê Biçûk binihêre, wê hîn çirûskan bibîne û ev ji hêviyekê dide me ku, em di pêşerojan de çiroknivîsaneke kurdî bejinbilind bibînin.



# Tayaya Şer (1)

Perdeya Yekem n

Li diwarekî odeyê postê nimêjê, sûretê yekî kurd ku bi cilên gelêrî tevgirêdayîye dar ve ye. Li diwarê din etamînek ku bi şahmaran xemilandiye daliqandiye. Kesên malbatê bi bez û bez in.

**Gewrê:** De zû keçê, tîtik fitlek din bi de xwe wext teman dibe. Sosin ji bo ku diya xwe biqehirîne bi ken:

**Sosin:** Ma çi bi te hatiye, bizdonek tu çi qas ji tirkên ditirsî...!

**Gewrê:** Ev tirs e an tevdfire, por kurê!

Bi malbatî diz dixwin. Sifre ji erdê tê-tê hilanîn. Nivîn tenê raxistin. Saet neh kêr pênc deqîqe ye. Tirêjan ditemirînin. Xasê heft sali ye. Hîvhat heşt sali ye. Her car layifî ji ser xwe diavêjin...

**Xasê:** Bavo, hûn tirêjan netemirînin wê çi bikin?

**Alo:** Keça min wê tim werin min biherin.

**Hîvhat:** Wê te biavêjin hepsê?

**Alo:** Wê min bibin, bi lingên tazî, hefteyek li ser berfê bihêlin.

**Xasê:** Bi lingên tazî meriv dimire?

**Alo:** Belê.

**Xasê:** Ji bo çi zarokên taxa me namirin?

**Alo:** Ez bêm girtin hûnê jî birçî bimînin.

**Gewrê:** Bi rêx be, qey heya niha em ne birçî bûn!

**Hîvhat:** Gur hatin, hiş bin!

**Alo:** Ez fêm nakim, ji bédengiyê jî ditirsîn. Navçe vala kirin, her carî xwe bi xwe sîlehan ber didin. Bi rojê jî zilm dikin.

Gewrê ber bi sûret ve diçe, bêhnêk kûr dikişîne. Tali dipeyive:

- Bi tenê ne ji bédengiyê jî dengê wan, ji qurqurikan, ji newal û çolan... Ji her tiştî ditirsîn. Ha, ji vî sûretî jî ditirsîn... Ew di tiştêkî de xwedî maf in, ew jî tirs e. Tabûtên bi al, dengê çendî çepikan... Tîtika bêbext dehan wekî sedan rê dide. Çepikên wan ji yê tirsê ne. Kes bi qasî me ne şahidê tirsê zarokên wan e...

**Alo:** Tevna ku wan li ber welatê me li darxistibû pûç bûye.

**Hîvhat:** Kî me zû dike xewê kurê ke-rêêye! Kî li dê û bavê me dide cahşee, kes nedikarî bi kekê mineeee...

**Alo:** Tu çi dibêjî kur o!

**Hîvhat:** Bavo ez wekî ku kilam bibêjim çêran dikim, ku kes fêm neke!

Sehneya Duyem n

Leşker bi awayekî hovane kesan berhev dikin. Çawîşê pisporek bi quretî diçe û tê. Her kesî dikin rêzê. Dawî li ser çongên didin rûniştandin.

**Çawîş:** Hûn hîç fedî nakin! Meriv ji birayê xwe yê dîrî re derewan dike. Do êvarî jî gundê we dengê sîlehan dihat...!

Feyat bi piste pist ji xalo Tayo re:

-Tu li biratiya dîrî binihêre; ji derî camiyê ta vir deh caran ji min re digotin bêxwedê o, ermenî lawê ermeniyân.

**Mamosta:** Ew dizanin ew çi dikin. Ku em nikaribin agir geş bikin jî divê em avê li agir nekin, birawo! Di vî şerî de êşa herî mezin ên wekî min û te, ku di navberê de mane dikişînin. Bi qewla Apê Musa, şivan Silo, ji dibêje em bêalîtiyê napejirînin. Kesê ne alîgirê dewletê be alîgirê "terorîstan" in.

Xwezî bi herkesî lê ne bi wan û misilmantiya wan.

**Tayo:** Hatine morala me xerab bikin, me bitirsînin...

**Seîd** (Ji bo ku hêrsa çawîş daxîne): Komutanê min, ka kerem bikin em bar-daxek çay vexwin, loqek nan bixwin!

**Çawîş:** Welat parçe dibe, nan çawa di qirika we de diçe. Ka hûn bibin cerdevan ku ez bizanibim em bira ne...!

**Zekî** (Di ber xwe de): Nan mîna şîrê diya me di qirika me de diçe. Bédengiya kesan wekî derba cigera çawîş parçe bike. Diqîre. Şivan diavêjin meydanê. Ji ber lêdanê şivan ditevize.

Di odeyê de du heb qenepe hene. Li ser qenepeya yekemîn Fatê û Rewşen rûniştî ne. Li ser qenepeya din mamosta û bermaliya wî rûniştine. Jina mamosta bi berdeyamî tenten çêdike.

Fatê (Nozdeh sali ye) ji mamosta dipirse: tu Rêdar nas dikî?

-Hevalê birayê min bû

-Zavayê min e.

Rewşen ji mamosta dipirse; Tu Zana nas dikî?

-Lêzimtiyek me ya dîr ve heye. Niha girtî ye.

-Wî ji min re Kapital dixwend.

Wekî ku bîr ve bike dike, hêj dipirse:

rana biharê peyv û gotin ji devê wê dibarînin:

-Em li hember şerekî kirêt tedişikîn. Her roj bi dehan kesên me tête qetilkirin, bi hezaran mirov koçber dibin, gund teneşewitandin, qet ne xema we ye.

**Mamosta:** Parêzer, tu jî bi me re bî, kes nakeve şikê. Ku bipirsîn jî dê tu bibêji xwarziya min hatiye gerê, em diçin barajê...

Rewşen radihêje telefonê.

**Mamosta:** Heval, bi serbestî neaxive, telefon ne ewle ye.

**Rewşen:** Ez hew halê yekî dipirsim...

**Fatê:** Qereqolên di mejiyê xwe de hilweşînin. TC ne ewqas xurt e, ku her kûçê û kolanan biparêze.

**Mamosta:** Hûn her du gundan nas dikin?

**Rewşen:** Ha

**Mamosta:** Parêzer, ka em biçin di derheqê her du gundan de hin agahyan berhev bikin.

Her du derdikevin. Fatê û Rewşen her yek paçikek hildidin, derdorê paqij dikin. Mamosta û parêzer dikevin hundir.

**Mamosta:** Gundek hatiye vala kirin. Gundê din jî li ser rê ye. Erebeya belediye yê saet di donzdehan de diçe. Ne hewceye em werin! Hûn bala keşî nakişînin.

**Parêzer:** Şuxula min heye ez diçim.

**Mamosta:** Îroj şuxula te çi pir e?

Fatê, Rewşen û Bermalî derdikevin.

**Mamosta:** Çi vite vit ketiye te; em çar insan li vir in, qey xwîna te ji ya me sortir e.

**Parêzer:** Yaho de bila biçin mala xwe...!

**Mamosta:** Ew dizanin ew çi dikin: Di çavê te de xwarziya te hêj zarok e. Ku em nikaribin agir geş bikin jî divê em avê li agir nekin, birawo! Di vî şerî de êşa herî mezin ên wekî min û te, ku di navberê de mane dikişînin. Bi qewla Apê Musa, şivan Silo, ji dibêje em bêalîtiyê napejirînin. Kesê ne alîgirê dewletê be alîgirê "terorîstan" in.


**Parêzer:** Em jî mîna serokê xwe ê li Ewropa diltenik in, bi aram in...!

Fatê û Rewşen alavên xwe amade dikin. Fate di kêliya xatir xwastine ji mamosta re: Li xwevegerîneke çîni divê.

**Rewşen:** Heval ji bo her tiştî spas! Hûn li warê xwe xwedî derkevin, ew jî baş e. Em jî kesên ku dilê wî bi welatê wî ve giredayiye, hez dikin.

Mamosta û parêzer serî ditewînin.

Parêzer bi dengêkî nizm: me fêm kir ku bê ka em bi kî ne...



**Çawîş:** Serzikî vezilin! Zû hadê zû...

**Kerem:** Tu ne xwedê yî, em secde nakin. Tu hîç fedî nakî, min lawek xwedî kir bû ebûqat, yê din bû mihendiz, yekî xwedî kir... Çawîş gotinê, ji devê wî hildide: Te dudu jî xwedî kirin, bûn terorîst.

Kerem ji ber lêdanê di nav xwîna de dimîne. Kesên vezelandî li dû hev û dû; wa; bênamûsiye, bênamûsiye, bênamûsiye...

Radibin ser xwe.

Perdeya Duyem n

Li ser perdeyê ev gotin hatiye nivîsandin: "Mejiyê me hatiye dagirkirin"(Se-

Navê serokê Yekitiya Dîndaran çi bû?

**Mamosta** pêşî dikene. Dawî bi pirsbersiv dide: Te Kedkarên Welatparêz bihîstiye?

Fatê dikeve navberê: Ooo, Tu Jean Paul Sartre dixwîni!

Parêzer (yekî sî sali ye) dikeve hundir.

**Fatê:** Were xalo.

Serê xwe datine ser singa xalê xwe, tali jê dipirse:

-De hûn sibehê bi me re werin gund?

**Parêzer bi ken:** Nerin, gund, ma wê çi bibê?

Fatê bi hêrs û made serê xwe ji serê xwe ji singa xalê xwe radike. Wekî ba-



Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 16.11.1997 **Yekşem:** Konsera Hozan Hogir, saet: 17:30

● 21.11.1997 **În:** Bîranîna Seyid Riza, saet: 17:30

Serokê Serhildana Dêrsimê Seyid Riza li Dêrsimê hatiye dinê (1862). Bavê wî Seyid Bîrahîm e. Tefî Seyid Riza çar bira bûn. Piştî ku bavê wî çû ser dilovaniya xwe, Seyid Riza bû serokê eşîrê. Wî tu car li hemberî zôrdestiya dijmin serî netewand. Seyid Riza piştî têkçûna serhildana Dêrsimê hate girtin û di sala 1937'an de hate darvekirin. Berî ku bê darvekirinê wê gotinê dibêje: "Dêrsim têk diçe, lê kurd û Kurdistanê wê her tim bijî!"

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li NÇM'ya Îzmîrê

● 18.11.1997 **Sêşem:** Siyaseta dewletê ya li ser Dêrsimê û Bîranîna Seyid Riza

Pêşkêşî: -Bilge Contepe (Seroka partiya Keskan ku hatiye girtin)

-Sami Feroğlu (Endamê PM'ya Partiya DBP)

-Hayri Ateş (Sekreterê HADEP'a bajarê Îzmîrê)

-Salman Yeşilgöz (Serokê Giştî Komeleya Dêrsimiyân)

● 21.11.1997. **În:** Konsera Stranbêj Leman: "Kîlamên dimilî û Kurmancî", saet: 18:00

# Aboriya nehênî bi narkotîkê dimeşe



**R**oja yekşemê li Navenda Çanda Mecidiyeköyê sempozyûmek ji aliyê İHD'ya Stenbolê ve hate li dar xistin. Fikri Sağlar, Sırrı Sakık, Yılmaz Ensaroğlu û Yücel Sayman wekî axîfger beşdarî sempozyûmê bûn. Sempozyûma ji hêla Serokê İHD'ya Stenbolê Ercan Kanar ve hate birêvebirin.

Axaftina yekemîn mebusê CHP'ê Fikri Sağlar kir. Sağlar di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku dewleta tirk ji dirûvê dewleteke hiqûqî tê dîrxistin. Lewre jî rê li ber azadiyan û mafên mirovan girtiye. Li gorî van agahiyan di salekê de pêncsed-şeş sed milyon dolar ji narkotîkê tê bidestxistin û ji vî pereyî aboriya nehênî (kayıtdışı ekonomi) tê pê. Sağlar da zanîn ku dema di nav karê aboriya nehênî de siyaset-

medar û bürokrat cih bigirin, riska wê kêmtir dibe û kara wê jî zêde dibe.

Bi awayê ku Sağlar dibêje pereyên ku ji narkotîkê tînin ji sedî 70'yê aboriya nehênî ya Tirkiyeyê pêk tînin. Piştî axaftina Sağlar, Serokê Baroya Stenbolê Yücel Sayman, ji aliyê hiqûqî ve kêşê nixand û daxuyand ku di nav dewletê de rêxistineke nehênî heye. Her wiha Serokê Baroya Stenbolê dadixuyîna ku qanunîkirina pereyên nehênî (kara para) jî bi riyên qumarxaneyan pêk tî.

Piştî re Serokê Mazlum-Der'ê Yılmaz Ensaroğlu jî li ser mafên mirovan û Susurlukê dîtinên xwe diyar kirin. Ensaroğlu di destpêka axaftina xwe de li ser axaftina Sağlar ku gotibû dewlet ber bi bêhiqûqiyê ve diçe got: "Dewlet kengî bû hiqûqî?" Serokê Mazlum-Derê Ensaroğlu bal kişand de ser kêşeya kurd got: "Çapamenî li ser Susurlukê bi awayekî gur di-sekine, lê wê tevkujiyên li Başûrê Rojhilat bi destê çeteyan pêk dihatin, nenivîsandin." Ensaroğlu daxuyand ku çete, şûrkeşên dewletê ne.

Piştî axaftina Ensaroğlu endamê PM'ya Hadepê Sırrı Sakık axivî. Sakık bi mînakeke dest bi axaftina xwe kir. Dema ew mebus bûye gundiyek bi destê kontrayan hatiye kuştin, li ser vê bûyerê raporek amade kirine, lê hikûmetê ev rapor nepejirandiye. Sakık di ber-dewama axaftina xwe de got ku; dewletê ji çeteyan re gotibû, "hûn li cografya kurdan çî dikin bikin, lê gava xwe neavêjin herêmen rojavayî, çeteyan guhê xwe nedane vê gotinê, lewre bûyera Susurlukê derketiye holê." Sakık di dawiya axaftina xwe de banga avakirina eniya demokrasiyê kir.

AZADIYA WELAT/ STENBOL

## TÎŞK

### Raştiya dîroke



LERZAN JANDİL

**E**bi xovîrardena şehîdanê ma yê na aşme ez wazena, ke dest bi nivîsê xo bikerî. Zê ke êno zanayene aşma 11'ine dîroka ma de aşmê de ebi kul û derdan e. Dersimî kerdî vîndî. Sey Riza û Pîlê Aşîran amê guretene. Naye ra tepiya M. Kemal şano Xarpêt, plananê kiştina Dersimî Abdullah Alpdoğanî ra museno. Gurtiyê Dersimiyê nemerdi wunciya na aşme de, tawe ke M. Kemal Xarpêt de ro ênê dardekerdene. Ez verê nemerdanê ma de ebi hurmet benîma çewt.

Wunca na aşme de medyaya Tirkiye seba cumhuriyê, seba M. Kemalî û seba cengê rizgariya tirkî yew kampanyayêde hîsterîke kerde ra. Na kampanya cawo hop hazir de niyamê rakerdene. Sebebê naye zaf ê. 74 serrî ra tepiya vatenê şaş û çewtî, îdeolojiyo resmî, dirûtiye zerê şarî mird nêdena. Hetê ra jî cengê kurdan raştî qonaxêde henîn, ke hem kurdî û hem jî tayê tirkî û kesê şaranê bînan îndî ebi nêşanîkanê kanan nêne xapiyene.

Sebete ke tenê raştiya wunciya bivejîme tija roje, ma waşt, ke na raye tayê "Cengî Rizgariya Şariye yê Tirkî" ser ro bivînderime. Zaf rêyan ser ro amo û êno qesekerdene, cengo ke leşkeriya Tirkiyaya ke Osmaniye ra vêşerî mendê bî, cengê rizgariya şarî yo, yan jî niyo?

Sebete ke mordemê Rojihalatê Miyanî xo ra durî zaf hîra, la belê der û dorê xo rê teng fikirîne, ma virêndiye yew mîsalêde durî bidîme.

Cengê dinyayê yewîne de Almanya, zê Osmaniya,, ceng kerdî vîndî. Fransizî kewtî Almanya. O taw gelê almanî hetê Ruhr de sarewêrdardayene de pasîfa viraşte. Yanê nêşî kar, yan jî giran xebetiyayî, tayîne jî waşt ke ebi çekan hemverê fransizan ceng bikerê. La belê nêşîkanê.

Dîroke de qe kes, qe yew dîrokzana yan jî politîkvan çînyo ke bivaco, çîyo ke almanan Ruhr de kerd, nişanê cengê rizgarî yî, yan jî elementê nê cengî tede estê. Çînay re? Çimke sebebê cengê împeryalistî Almanya bi xo biye. Eke ceng kerdî vîndî jî, bê guman Fransa xo de heqe diye ke, bikuyo Almanya. Naca qe yew tomate çîna, her çî zê normalî yo û normal jî êno diyene.

Ma bêrîme hardê împaratoriya Osmaniyan. Împaratoriye jî zê Almanya sebebê cengê împeryalistiyê neheqî biye û aye jî zê Almanya no ceng kerdî vîndî. Naye ser ro qewetanê bînan, hardê împaratoriye wertê xo de kerd parê û kewtî hardê împaratiye.

Hetê ra generalê ke nêkewtê destê qewetanê girsan; hetê ra zafêriyê kurdan, kêmasiyê jî kurde ke kewtê kongreya Erzurumî; hetê ra bawariya îslamî; û hetê ra jî bawariya pan-turanîzmî seba "sarewêrdardayena" leşkeriya tirkî bî binge. Se ke êno zanyene jî na sarewêrdardayeyne virêndiye hemverê şenîkanê Tirkiye, zê ameniyan, ruman, kurdan amê kerdene.

Heto bînan ra, Şoreşê Sovyetî seba hetkariya împeryalistan biye mane û ebi naye "sarewêrdardayena" tirkî hetkariya împeryalistan gurete û biye legîtim.

No dem de teyna ruman ebi teşvîkê îngilîzan kewtê hardê împaratoriye û wunciya ebi teşvîkê îngilîzan û împeryalistanê bînan û tene jî ebi sarewêrdardayena Çerkez Etemî û paşayanê bînan mecbûr mendî, hardê împaratoriye ca verda.

Nê sebebî pêro seba almanan nêbenê, la belê Tirkiye benê sebebê cengê rizgariye! Naye de yew çewtiye esta. Ganî na çewtiye ser bêro vîndetene. Nivîsanê xo yê bînan de ma na mesela ser ro wunciya vîndetene.



Em wek darin  
Car heye em radizên  
Radizên  
wek şivanê piştî şevîn  
Belê di xew de jî  
Em ji piya ne  
Em nakevin  
(Evdillah Pêşew)

### Hüseyin Bozkurt

Nûrheq bi te dibiriqî  
Di tariya şevê de  
Û wê hetavê me li xwe dialiqand  
Berî xewa mirinê

Li ser navê hevalên wî  
**MAZLUM DOĞAN**



# Şenglo, Menglo, Eliçenglo

**H**ebûye tunebûye, keriyek pez hebûye. Di nav vî keriya pez de bizinek avis rojekê li paş dimîne. Bizina reben bi serê xwe li serê çol û çiyayan dimîne. Bizin radibe diçe ji xwe re kolikekê çêdike. Dem dibihure sê heb karik çêdibin. Navê yekê datîne Şenglo, navê yekê datîne Menglo, navê yekê jî datîne Eliçenglo.

Diya wan dibêje:

Şenglo, Menglo, Eliçenglo!

Diya we dê here mêrg û çimena,

Karik dengê diya xwe nas dikin, radibin derî vedikin, diya wan dikeve hundir. Wexta ku diya wan dîsa derdikeve diçe, Gurê çavzûr tê li derî dixê. Bi dengê stûr dibêje:

Şenglo, Menglo, Eliçenglo!

Ez diya we me

Hatime dana,

Derî vekin.

Menglo û Eliçenglo dibêjin em derî vekin, diya me hate dana. Şenglo dibêje:

Ez dengê diya me nas dikim, ev ne diya me ye. Ev gurê çavzûr e.

Paşê jî ji gurê çavzûr re dibêje:

tê. Gurê çavzûr xwe wekî diya wan dike, karik îcar dixapin, radibin derî vedikin. Gur hersêkan jî davêje hundirê xwe û pişt re jî ji wê derê dûr dikeve.

Wexta ku diya wan tê, dibêje:

Şenglo, Menglo, Eliçenglo!

Ez diya we me,

Hatime dana,

Hûn li ku derê ne?

Way, way!....

Bizin diçe ser mala rovî, dibêje:

Rovî, tu bi Xwedê bikî te zarên min nedîtine?

Rovî dibêje:

Kevrişk dibêje:

Tep tep dikî, rep rep dikî. Tê mala min tep dikî. Tu kî yî?

Bizin dibêje:

Kevrişkê, parî hevrişkê.

Te zarên min nedîtine?"

Kevrişk dibêje:

Na, min zarên te nedîtine.

Bizin radibe diçe, lê dinihêre gurê çavzûr di newalekê de xwe li ser pişt avêtiye erdê, bi qirşikê diranê paqij dike.

Bizin dibêje:

"Ê ê ê, gurê çavzûr, ez dizanim te karikên min birine.

Gurê çavzûr dibêje:

Mî, mî, min. De here! Ezê te li riya karê te venegerînim.

Bizin ji gur re dibêje:

Ez ji te dozdar im. Sibê em herine şerîetê.

Bizin diçe qasikek katixê (mast) xwe dimeyîne. Gur diçe hewana xwe tijî dike. Bizin diçe, qoçê xwe tûj dike. Gur jî diçe diranê xwe tûj dike. Diçe ba Rovî, dibêje:

"Birayê rovî, min nêçîrek girîtiye. Emê lêxin. Nivî ji min re, nivî ji te re.

Rovî dibêje:

Bêje Gur. Derdê te çi ye?"

Dibêje:

Diranê min tûj bike.

Rovî kartika xwe tîne diranê gur dioxifine (koh dike). Dibe sibe diçin Şerîetê.

Gur tîne hewana xwe vedike, hundir tijî bihn dibe. Wexta bizin katixa xwe vedike, bihna gulavê dikeve hundir. Derdikevine meydanê. Bizin çawa qiloça xwe li zikê gur dixîne, ûrê gurê çavzûr diqelişîne.

Gava ku zikê Gurê diqelişe her sê karikên bizin jê derdikevin. Diya wan dibêje:

Şenglo, Menglo, Eliçenglo!

Hûn bi ku derê ve çûbûn."

Her sê bi hev re dibêjin:

Dayê, em çûn mala apê gur. Me ji xwe re list kapkapok.

Êw çûn bi mirazê xwe şa bûn.

Hûn jî bi mirazê xwe şa bibin.

BERHEVKAR: KAWA NEMIR



Şîr têkeve gihana,

Ê were dana.

Wexta ku diya wan tê, dibêje:

Şenglo, Menglo, Eliçenglo!

Diya we çû mêrg û çimena,

Şîr kete gihana,

Hate dana.

Rojekê gava ku wiha dibêje gurê çavzûr li wan guhdarî dike û tiştê ku bizin ji karikên xwe re dibêje ji ber dike.

"Here, here, ne tu diya me yî. Tu gurê çavzûr î."

Piştî demekê diya wan tê. Gur xwe ditelîne. Diya wan dibêje:

Şenglo, Menglo, Eliçenglo!

Ez diya we me,

Derî vekin,

Ez hatime dana.

Derî vedikin. Diya wan dikeve hundir.

Diya wan derdikeve diçe, gurê çavzûr

Ez bi xwe kim ez bi Xwedê bikim, min zarên te nedîtine.

Diçe ser mala hirçê, dibêje:

Hirçê, qulpîrçê! Tu bi xwe bikî, bi xwedê bikî, te zarên min nedîtine?

Hirç dibêje:

Ez bi xwe bikim, ez Xwedê bikim, min zarê te nedîtine.

Diçe ser mala kevrişkê, dibêje:

Tep, tep dikim, rep rep dikim.

Wextek, zemanek hebû

Bêkin û bêfit nebû

Tê hebûn mirovên delal

Xweyê rez û pez milk û mal

Cotek diz li wan rabû

Çavên wan li malê wan bû

Dizan li wan silav kir

Wan ji ber qiyam kir

Êw birin odeya mêvanan

Dan wan hingivê şanan

Goştêk mirîşka û şamiyan

Birinc û tîrşê bamiyan

Wan xwar zik dan berê

Hindik ma di dev da werê.

Çay û qehwe firkirin

Eslên wan pîrs kirin

Gotin: Em qutî in, zat in, şêx in

Em hatin we di bin emrê Xwedê kin

Gava qala Xwedê kirin

Wan ji ber qiyam kirin

Gotin: Hûnê rûnin li ser çokan

Hûnê bigirin her du çavan

Gava şêx li sohbetê sor be

Çavên vebe, wê kor be

Rûniştin li ser çokan

Girtin her du çavan

Qafê serî perçe kirin

Newêrin çavan vekin

Eviya şêxek qelb reş e

## Şêxê qelpreş û dizîti

Ti xwe kiriye bêhnek xweş e.

Hinekan gotin: Ev nuzbet e

Na, gotin: Bena şêxê hezret e

Sofiya hanî tekiye tije kir

Şêx hat û lê mêze kir

Gote kurê min hindik e, salê

nake dere

Gotin: Belê şêxê me, wê hîn ji


paş de were

Çavkanî: Xaltîka Bes

BERHEVKAR: ROŞAN LEZGÎN



# Mezrabotan im ez



Ji komên NÇM'ê Koma Rojhilat kasetaya xwe ya yekemîn "Mezrabotan im ez" derxist. Ev kaset li stûdyoya Kom Muzîk Yapım hatiye tomarkirin. Helbesta strana ku navê xwe daye kasetê ji hêla Seroka Giştî ya NÇM'ê Nûray Şen ve hatiye nivîsîn. Di destpêkê wekî helbestî ji hêla Amed Mahsûm ve hatiye xwendin, piştî re jî stran hatiye gotin. Helbest ji aliyê na-


verokê û xwendinê ve gelekî balkêş e.

Di kasetê de piraniya stranan gelêrî ne û ji bilî strana bi navê "Cizîr e" hemû stranên gelêrî jî ji herêma Serhedê hatine berhevkirin. Stranên ku awaz û helbestên wan ji hêla endamên komê ve hatin çêkirin, bi piranî li ser şer û şoreşê ne. Di vî warî de strana li ser Zilan hêjayî dabaşê ye. Ji bilî strana "Pêro piya" ku straneke bi kirmanckî (dimilkî) ye, hemû stranên ku di nava kasetê de cih girtine bi zaravayê kurmanckî ne. Di kasetê de strana ku ji alî naverok û awaza xwe herî zehf balê dikişîne "Xiringê" ye. Ev stran, ji aliyê naverokê ve xwediyê rengêkî mîzahî ye û mûzîka wê mirovan radike govendê. Akordiyûmê ku berî destpêkirina strana navborî, tê lêxistin, rengêkî taybet dide wê. Dîsa strana kirdkî "Pêro piya" bi awaz û gotina xwe balkêş e, li gorî agahiyên li ser kasetê ew strana gelêrî ji hêla endamên komê ve li kirmanckî hatiye wergerandin. Mirov tê derdixê ku ew stran ji tirkî hatiye wergerandin. Lê mixabin nehatiye gotin ku ew ji kîjan zimanî hatiye wergerandin. Her wiha strana bi navê "Newroz" ê ku gotin û awaza wê ji hêla komê ve hatiye amadekirin, ji hêla mûzîkê ve xweşik e, lê naverokê piçekî qels ketiye.

Di kasetê de gelek amûrên cur bi cur hatine bikaranîn. Lê bikaranîna wan amûran stran ji rengê gelêrî dûr nexistine.

SERWISA ÇANDÊ

# Mihemed Arifê Cizrawî



B i avabûna saziyên kurdî re, nîrx û hêjayiyên me jî ji windabûnê rizgar dibin. Piraniya kesên ku haya wan ji kurdatiyê heye, navê Mihemed Arifê Cizrawî nebihîstine. Dema muzîka kurdî tê gotin, digel çend mirovên din, navê wî jî tê bîra mirov.

Li bal gelek kesan kasetên wî peyde dibûn, lê kaseteke wî ku bi tek-

nîka îro hatiye tomarkirin û li piyasa yê dihat firotin bi dest nediket. Lê bi saya Kom Mûzîk Yapım, ev yek jî pêk hat. Vê şirketê digel NÇM'ê kasetaya "Stranên Bijartî" a Mihemed Arif Cizrawî û Hesen Cizrawî tomar kir. Di vê kasetê de li aliyê heşt heb, li aliyê din heft heb bi tomarî 15 stranan cih girtine. Piraniya stranan ji bo kesên ku bi mûzîka kurdî re eleqedar in, nas in. Hinek jî wan stranan ji hêla hûnermendên wekî Şivan Perwer ve hatin gotin û nav û dengê wan gelekî belav bûye.

Li ser muzîka Cizrawiyan hewce nake mirov tiştêkî bibêje, lewre êdî ew ketine nava klasîkên kurdî. Karekî hêja ku ji hêla amadekarên kasetê ve hatiye kirin jî ev e ku digel jînenîgariya M. Arifê Cizrawî, gotinên hemû stranan hatiye nivîsîn.

## Kî dibêje Tirkiye feqîr û lipaşmayî ye

OSMAN ÖZÇELİK



Tirkiye, ne bi qasî ku tê gotin; şûndemayî, feqîr û belengaz e. Aboriya Tirkiyeyê, tevî şerê qirêjî ku bi milyaran dolar dixwe, dîsa jî bi pêş dikeve.

Mirov Tirkiyeyê bi cîranên wê re rûberî hev û din bike û mirov, li Sûrî, li Îran, li Iraq, li Ermenistan, li Bulgaristan û heta li Yewnanistanê binêre wê bê dîtîna ku Tirkiye xwediyê aboriyek xurt e. Li Îran û Iraqê "petrol" dayinek xwedayî û xwezayî ye ku ew qas qencî bi tu kesî nebûye. Dîsa ji refah û şadî tune.

Zanistiya aboriyê pîvanên xwe yê taybetî derxistine holê. Pîvana herî girîng; jêhatîna nêteweyî ya li para kesekî dikeve ye, (fert başîna dîşen millî gelîr). Para yek kesî çiqas bilind be, ew welat ewqas dewlemend tê qebûl kirin.

Li gorî îstatîstîkên dewletê yê sala 1995'an, ji jêhatîna dewletê her kesekî 2800 dolar lê dikeve. Mafê xwendevanî heye ku bipirsin "2800 dolar û dewlemendî?" Bi rastî jî, li gorî dewletên pêşketî ev ne tiştêk e jî.

Belê ev reqem mirovan dixapîne. Ji ber ku ev reqem li gorî hesabê kêmbûnê ye. Ev reqem li bajarê Kocaelî 7349 dolar e, li Hekariyê jî 765 dolar e. Li Mûşê dadikeve 660 dolarî. Ango feqîrî li Kurdistanê ye, ne li Tirkiyeyê ye.

Heger mirov piçekî din li ser van hejmaran raweste, wê bê dîtîna ku ferqî mezintir e. Ji ber ku em dizanin kesên li Kocaeliyê dijîn ne tenê tirk in, gelek koçberên kurd, li wir jî bi cih bûne. Kurdên li bajarên Tirkiyeyê dijîn di karên herî giran de dixebitin, lê belê qezenca wan a diravan ne ji kesên ku li Mûş, Şernex û Hekariyê dijîn, pirtir e. Mirov kurdên Kocaeliyê nexer nav hesêb, wê di hesabê kêmbûnê de para hatina kesên Kocaeliyê bilind bibê û wê bigihîje 10 hezar Dolar î. Ev jî 15 qatê Mûşê ye.

Di gengeşiyên de, gava mirov dibêje; ji hêla aboriyê de bajarên kurdan ji Afrîkaya reşik şûndemayîtiya hatiye hiştin, bersiva bîrdoza fermî amade ye: "Gelek bajarên tirkan jî feqîr in..." rast e. Ne gelek, belê çendek bajarên tirkan jî feqîr in. Ji van yek Yozgat e. Li Yozgatê para yek kesî 1245 dolar e. Barê din jî Gümüşhane ye, parê wê jî 1696 dolar e. Yozgata feqîr, ji Wana me yî dewlemend (!) dewlemendtir e. Ji ber ku li Wana serê mirov 1015 dolar li para wan dikeve.

Zanistiya aboriyê, pîvanekê din jî bi kar tîne: "Bêkarbûn", li gorî îstatîstîkên xebatê, bêkarbûn li Tirkiyeyê roj bi roj zêde dibe û di sala 1997'an de bêkarbûn gihîştîye ji sedî

9'an. Ango ji her sed kesên ku dikare karekî bike, kar bi destê wan nakeve 9 kes in. Ev jî sedî û yek mezin e. Li welatê pêşketî ev jî sedîya di navberî 1-3 an de ye. Belê ev reqem jî, çiqas rast be jî, mirovan dixapîne. Bêkarbûn di nava kurdan de jî sedî 30-40 e. Û ev reqem li ser Tirkiyeyê tê hesabandin. Ma jî ku bêkarbûn di nava tirkan de ewqas zehf e. Ez ne bawer im ku tirkên bêkar jî yêna Îtalya zehftir bin.

Pîvanên din jî hene. Mîna di salekê de li serê yek mirovî çend kilo goşt, çend kilo şîr, çend hêk dikevin. An berxwarîna (tûketim) enerjîyê fikrekê dide mirov. Enerjî îşarete endûstriyê ye. Tirkiye bi firotina malên endûstriyê, ji firotina berên çandiniyê zehftir dovîzan bi dest dixwe. Çandîna jî kurdan re hiştine. Şerê taybet û qirêjî çandîna jî ji holê rakirîye.

Hebûna rê, av, elektrik û telefon pîvanek din ya pêşketî ye. Berxwarîna kaxez, pirtûkan jî pîvanekê din in.

Em ji kîjan hêla de lê binêrin, bila em lê binêrin, Tirkiye ne feqîr û belengaz e. Tirkiye bi hebûn û hatina berê Kurdistanê dewlemend e. Bi hejarbûnê tunebûn û feqîrhiştina kurdan feqîr dixuye.

Mê di hejmarê 92'an ya Azadiya Welat de gotibû, li Tirkiye "demokrasi" heye. Îro jî em dibêjin "dewlemendî" heye. Ji bo ku mirov yê rastiyê qenc bibîne, divê mirov bizanibe rast bifikire û bizanibe ku Kurdistan û Tirkiye du cografayên cuda ne.



# Gavan, Miho û hirçên har

## Têrxwarin tuneye

**R**ojekê hirçekî pir dijwar dikeve nav rezê mîr. Hemû der li hevûdin xistin. Wisa kiribû ku tu kes ji tîrsa hirçê û hin jî xerabûnê nedîçû nava rez. Mîr dibêje: "Wiha nameşe" û delalekî derdixe nava gel, bang dike, dibêje:

-Yên ku vê hirçê bikuje, ew dê xelateke rind û buha bistîne.

Çend roj di wê navberê re derbas dibin, yekî nêçîrvan di rê de diçe, dibîne ku hirç miriye. Zend û bendên xwe vedimale û bi lez tê mala mîr, dibêje:

-Mîrê min, min hirç kuştiye û ez hatime xelata xwe dixwazim.

Mîr dibêje: "Kurê min ezê te biceribînim. Ger te hirç kuştibe, ezê xelata te bidime te." Mîr bang melayê mezin dike û nêçîrvan dixwaze cem xwe. Dibêje: "Emê pîrsekê ji te bipîrsin. Heger tu zanibî, tuyê xelata xwe bistîni û tuyê herî mala xwe."

Mela dibêje:

-Ê kurê min de ka bêje, te hirç çawa kuştîye?

Nêçîrvan dike ku bersiv bide, pê re bi mîr dengêkî stûr û bilind ji kêleka wî ji nişke ve dibêje: "Pixt!" û destê xwe li piştê wî dixê. Nêçîrvan gazekê ji êrdê bilind dibe û gelekî ditirse. Li ser vê yekê jî mîr ji nêçîrvan re dibêje:

-Tu derewan dikî. Kurê min tu rabe here

mala xwe. Bi vî awayî gelek kes diçin û tîs, lê belê kesî ku rast dibêje derneket. Bi rastî jî gavanê wan hirç kuştiye û nabêje min hirç kuştiye. Gavan rojekê dinêre gelek çûn û hatin çêdibe. Dipirse dibêje: "Ka ev çûn û hatin ji bo çi ye?" Hinek jê re dibêjin: "Ji bo kuştina hirçê ye." Gavan dibêje: "Min zanibû-ya minê hirç zû de bikuşt." Jê re dibêjin: "Ma te hirç kuştiye?" Gavan dibêje: "Belê min hirç kuştiye."

Xeber ji mîr re diçe. Mîr, wî dixwaze cem xwe û dibêje ka em wî jî biceribînim. Gavan, kuçîkekî wî heye navê wî Deqo ye. Deqo li ber derî dihêle û diçe hizura mîr. Mîr dibêje:

-Ka were kurê min. Bêje te çawa hirç kuştiye ji mîrê xwe re bêje?

Mîr û mele li ber hev û din rûniştine. Gavan jî li hemberî wan e: Gavan darê xwe yê gavantiyê bilind dike û dibêje:



-Mîrê min, wekî ku tu hirç bê û mele jî Deqo bê." Dema wiha dibêje, mîr ji nişke ve dibêje: "Pixt."

Gavan dibêje: "Pixt û nizamim çî... Ma ez ji hirço netersiyame, ezê ji pixta te bitîrsim. Û darê xwe li serê mîr dixê û mîr bi derba wî re dikeve û dimire.

E. EMÎN ALTUĞ

**S**ê mirovên qure ji xwe re li civatekê bûne heval, piştî gelek pîrs û bersiv, ken û henekan, yekî jî civatê pîrsî:

Ji bo Xwedê hûnê rastî bêjin têrxwarin çî ye û çawa ye?

Yekî ji wan got: "Binêr keko li dinyayê tu car têrxwarin tune ye."

Yê diduyan got: "Têrxwarin ew e ku tu bixwî heta ku xwarin were ber qirika te." Mirovê sêyemîn jî di bin gotinê wan de nema, wî jî wiha got:

-Na têrxwarin ne wilo ye, têrxwarin ew e ku tu îşev bixwî û şeveke din yek ji te bipirse te şevê din çî xwariye, tu tîlîya xwe tîxî qirika xwe û xwarinê jê derxê û bêjî min ev xwariye.

E. EDENİ


## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (94) XAÇEPIRSA

Mehmet Nevrûzî Kurdî	T	Herîdî Çarçîn Mêlîyê	Ş	Dîrî Dîrî Dîrî	M	Şêrî Jêdêkî	T	E E E	Okûbî		
Edîmarî Roj	Q	A	N	A	T	Ê	K	U	R	D	O
Herîdî Roj	V	E	H	E	W	A	N	D	Î	Paşîrî	
Herîdî Roj	H	E	T	A	V	N	D	N	A		
Herîdî Roj	H	E	N	K	Î	N	N				
Herîdî Roj	D	I	W	X	E	T	E	M	E		
Herîdî Roj	V	E	K	O	L	I	N				
Herîdî Roj	P	T	U	A	R	Î					
Herîdî Roj	M	I	N	A	Ê	Ş					
Herîdî Roj	S	E	B	R	A	J	E				

PEYVA VEŞARÎ →

### Bersiva Xaçepirsa 92'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 94'an kasetê Koma Rojhilat "MEZRABOTAN EM EZ" e




**Jêrenot:**  
Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.


Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmarê 92'yan pirtûka Seracettin Kılıç (Nafîna Şevî) qezenc kirine: Mustafa Berk/Riha, Tuncay Bal/Manisa, İ.Oktay/Enqere, Metin Aslankan/Semsûr, Aydın Durmaz/Amed

Ajal Pêşengek (wêne)	Li Mîstrê Çemek Tîfaqî	Ordû Amûreke darbîr	Asîman	Gihaneke k Ajansa tîrkan	6	Navek
1				2	Kukurt Kesê Rûsyayê	
Nîştîman		3	Makew			
Erd		...Sor Beşekî hunerê		Amûreke mûzîkê Lê ard tê herandin		
Hêlîn Tipek		Tîpa berî T Tipeke 'nan'	Rêxistînek e DYAYê Herêmeke Rîhayê			
4	Germî Rebenî		Qadî	Jê mast çêdibe Is		8
Heyat Nexweşiyê k		Tebeqe Cînavkek				
	Nîşane Di mûzîkê de rawest- in			7		
Navê meha rojtyê Cardî	5					
		Rojek				

PEYVA VEŞARÎ →







**WELAT**

Rojnameya Hefteyî  
(Haftalık Gazete)

Li ser navê  
Zerya Basın ve  
Yayıncılık  
San. Tic. Ltd. Şti.  
(adına)  
Xwedî (Sahibi)  
CELALETTİN  
YÖYLER

NAVNİŞAN  
Ayhan Işık Sk. No:23/3  
Beyoğlu / İSTANBUL  
TEL-FAX  
(0 212)  
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê  
(Yayın Yönetmeni)  
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên  
Nivîsaran  
(Yazı İşleri Müdürü)  
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê Saziyê  
(Müessese Müdürü)  
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE  
Yeni Asya Matbaacılık  
A.Ş.

BELAVKIRIN  
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME  
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:  
(Nünerê Giştî yê  
Ewropayê)

Mahmut Gergerli  
49 871 67 08 15

Brüksel:  
Medenî Ferho  
32 532 721 12 03

Suriye:  
Jana Seyda  
Helîm Yûsiv

Berlin:  
Silêman Sîdo  
00 49 30 691 6495

Hannover:  
Selîm Biçûk  
49 572 18 13 60

Stockholm:  
Robin Rewşen  
46 87 51 05 64

Bonn:  
Ahmet Baraçkılıç  
49 228 66 62 49

Hollanda:  
S. A. Fewzî  
31 104 85 55 43

VENGÛVAZ

# Rojbaş Kızıldere

Nê vatenan ra oyo ayseno ke nûwa tepya, şarê Kızılderey û çöşmeyê ci no, "Rojbaş gerîla" vaten kemî mekro. Çimke gerîlayanê Artêşa Reyayinê Şarê Kurdistanî verdê çend mangan înan rê vat: "Rojbaş şarê Behrê Siyay (Karadeniz)."

Nameyê Kızılderey, hema hema hemû wendoxê Azadiya Welatî û hemû şoresgerî zanê û vaten ke ca de bo, wexto ke nameyê Kızılderey cayê vînenê yan jî eşnê, zerya ci veşena. Çimke Kızıldereya piya nameyê Mahir Çayan û embazê ci yenê kesî virî. Zek yeno zanayin, Mahir Çayan û embazê ci na dew de, şehîd kewtî û bî vilikê şoresê Tirkîye. Coka nameyê na dew dîroka şoresê Kurdistan û Tirkîye de cawo rind û delal giroto.

Şanê 7'ê sermawez de, Komalê Çand û Paystgeniyê Dewa Kızılderey (Kızıldere Köyü Yardımlaşma ve Dayanışma Derneği) Ümraniye de şewa paystgenî (dayanışma) virast. Şew tewrbiyinê nezdiyê 700 kesiya "Salona Prenses Plaza" de virazyê. Şew şewa Muzikî bî, la belê kesî vatê qayê şewa siyasetî ya. Çimke êkê ameybî şew, giranî siyasetkarî bî. Vaten ke ca de bo şew qandê siyasetî û qandê Kızılderey, belediye-kerdin virazyêbî. Coka qîsey giranî çetan û Kızılderey, belediye-kerdin sero vajiyay. Çetan û belediye-kerdin ser, serokê komalê Kızıldereyê verin Ali Gökçekî namedê komaliya wina vat: "Nezdiyê 15 serî yo, jû kiştê welatê ma de jew şero lîmin û nêhaqo rameno. Dewlet nê şerê lîminî de hîrê hezarî dewê şarê kurd veşnay, heveyê nînan kerdî vengî û zîndanî jî xortanê kurdana kerdî pîrî. Ancî nê şerî de, nezdiyê 30 hezar xortê kurdan û tirkan kişiyay." Gökçekî da zanayin ke, çeteyê ke ewro vejîyayê werte, ê pêro şerê lîminî ra vejîyayê û ê çeteyê wazenê ke, nika jî destê xo çekrê Kızıldere û çöşmeyê ci. Gökçekî qiseyê xo wina ramîti: "Ek ma verê nê çetan megim, nê çeteyê zey dewanê kurdan, dewanê ma biveşnê û zey xortanê kurdan jî xortanê ma bikê." Gökçekî Kızılderey belediye-kerdin ser jî wina vat: "Mayê wazem dewa xo

belediye kim, la belê qandê belediye-kerdin jî gerek pêro piya bixeftiyim. Ek pêro piya bixeftiyim, şemi Kızılderey belediye kim. La belê qandê belediye-kerdin, şima ra jew wastenê ma esto, şima jî zanê ke hîrisê meng de amor (sayım) esto. Qandê nê amorî jî ma dê 30'ê meng de otobosana şimi Kızıldere û nezdiyê 600 mardimî bemi Kızıldere û

xo wija binûsim. Qisandê Gökçekî peyra komisyonê xortanê HADEP'a Sultançiftliği ra 3'ê xortan deyrê kurdî vatî û nê deyrana şelîkî govendî antî û peynî de jî deyra "Rojbaş gerîla" vajiyê û şelîkî jû kişt ra govend antê û kiştê bîn ra jî gerîlayan rê vatê, "Rojbaş". Peyniyê deyra "Rojbaş gerîlay de heveyê xortan vat: "Rojbaş gerîla, rojbaş Mahir, rojbaş Kızıldere".

Nê vatenan ra oyo ayseno ke nûwa tepya şarê Kızılderey û çöşmeyê ci no, "Rojbaş gerîla" vaten kemî mekro. Çimke gerîlayanê Artêşa Reyayinê Şarê Kurdistanî verdê çend mangan înan rê vat: "Rojbaş şarê Behrê Siyay! (Karadeniz)" Bado hunermend Muzafer Demirî deyran û Tenbûreyaya, Komê Semahî jî semah antena, şelîk kerd zaf kêfweş. Şew rê keylê koman, partiyan ra HADEP, ÖDP, EMEP û CHP jî mesajî riştîbî.

AZADIYA WELAT / STENBOL



## EŞBER YAĞMURDERELİ VIRADIYA

Dewleta tirk reaksiyonan ser 9'ê meng de, Eşber Yağmurderelî virada. Zek yeno zanayin, zere çekerdinê Yağmurderelî ser, reaksiyonî bibî vêşî û dewlet jî, nê reaksiyonan ser verî wast qandê Eşberî efo taybet vejo, la belê qebûlnêkerdinê ey ser, dewlet jî fikrê xo vurna û vat: "Eşber sûkarê fikirî niyo, terorîst o." La belê reaksiyonî ancî kemî nebî û dewlet mecbûr mend qandê çimandê ci jew rapor da û çöşmeyê nê raporî de 9'ê meng de Eşber virade. Viradayin de Eşber Yağmurderelî girotxaney ver de, eşkera kerdin virast û vat: "Tirkîye Tirkîya wa verin a û fikir eşkerekerdin zey verî sîc o." Yağmurderelî qiseyê xo wina qedîmay: "Ezo xeftiyayanê xo, zey verî biramî û hendok İsmail Beşikçi mevradiyo, ne ez bena azad û ne jî fikir beno azad."



*Ji girtiyên ku ji qetlîama Amedê filitî ye Nusret Yelboğa:*

# Armanca tevkujiyê, Afirandina îtirafkaran bû

**Roja 24'ê rezberê tevkujiyê ku li rûyê dinê minakên wekî wê kê m in, pêk hatibû. Wê rojê hêzên dewletê ku ji gardiyan, leşker, polis û kontrayon pêk dihatin li girtîgehê êrîş biribûn ser girtiyên PKK'yî. Di encama qetlîamê de 10 girtî hatibûn kuştin, 23 girtî jî birîndar bûbûn.**

**L**i Girtîgeha Amedê roja 24'ê rezberê tevkujiyê ku li rûyê dinê minakên wekî wê kê m in, pêk hatibû. Wê rojê hêzên dewletê ku ji gardiyan, leşker, polis û kontrayon pêk dihatin li girtîgehê êrîş biribûn ser girtiyên PKK'yî. Di encama qetlîamê de 10 girtî bi awayekî hovane hatibûn kuştin, 23 girtî jî bi awayekî xedar birîndar bûbûn. Piştî vê tevkujiyê bi hewldana malbatên girtiyan û parêzeran der barê hêzên dewletê de doz hatibû vekirin.

Dadgeha vê qetlîamê roja 23'ê kewçêrê li "1. Ağır Ceza Mahkemesi" ya Diyarbekirê pêk hat. Danişîna ku roja 24'ê kewçêrê pêk hat de, polisên bersûc îfade dan. Di danişîna dadgehê de parêzêrê leşkeran Şevket Can Özbay ku parêzeriya çeteyan dike û parêzêrê polisên bersûc Ziya Özbey jî bi hin daxuyaniyên xwe yê seyr û sosret bal kişandin. Di danişîna dadgehê de polis û leşkerên bersûc bi tevî parêzerên xwe sîwdariya xwe bi awayekî trajî-komik nepejirandin û di îfadeyê xwe de tevkujî mafdar nişan dan. Derheqê wê rojê de, ji 23 girtiyên ku birîndar bûbûn Nusret Yelboğa û Ahmet Çelik tiştên ku qewimibûn anîn zîmên.

**Nusret Yelboğa:** "Di qawîşên 18 û 29'an de roja hevdîtîne bû. Koma yekemîn derketibû hevdîtîne. Ji bo ku heval tiştên ku ji wan re hatine pê bibin jêr, ji bo legenekê çûbûne ber mezgalê, lê gardiyana rê li ber wan girtibûn. Berê bi hevalên li pişt mezgalê re hevdîtîne pêk di-anîn, qet pirsgirêk demediketin. Ev ji di-hate vê wateyê ku kirina gardiyanan provakasyon bû. Ji bo ku heval rê li ber pirsgirêkan bigirin, neketibûn nav bûyerê, piştî hevdîtîne derbasî qawîşên xwe bûbûn. Navê koma duyemîn ku wê der-kevin hevdîtîne hate xwendin. Em ji qawîşan derketin, ber bi qabînen hevdîtînan ve çûn, lê gardiyanan nehiştin, li ber vê hewla me bûn asteng.

Me sedema vê yekê pirsî, sergardiyana Fethi Ahmet Onat wiha got: "Ji îro û şûn de ji mezgalan hevdîtîne qedexe ye." Wê gavê hevalê Remzî Tanrikulu hat ber mezgalê û ji F. A. Onat re got: "Ev tewra we ne rast e." F. Ahmet Onat ji kulemek dawêşand Remzî Tanrikulu û jê re da çêran. Piştî demeke kurt gardiyan giş jî deriyê qawîşan, derketin deriyên hesi-

nî girtin. Piştî çend deqîqeyan midûrên girtîgehê Mehmet Çaçan, Aziz Güler û Halil... tevî serbazê girtîgehê û çend leşkeran hatin. Ji ber ku Fethi Ahmet Onat Gotibû: "Min lêdan xwariye" midur Mehmet Çaçan gotibû: "Kê li Fethi Ahmet xistiye?", ji kesî bersiv nehat. Wê gavê sergardiyana wiha got: "Remzî Tanrikulu ji di nav de hemûyan li min xist"

cop, hesinên zirav û dirêj û darên bi bizmar hebûn. Em di nav bi sedan leşker, polis û kesên nenas de mabûn. Digotin an hûnê bibin îtirafkar an jî hûnê bêne kuştin.

Girtiyekî bi navê Gani İzgi ji nav me reviya û xwe sparte wan. Lê hevalên din gotin: "Em bîn kuştin jî, em nabin îtirafkar." Piştî vê tewra me êrîş anîn ser me

kenceyên di ringê de şehîd ket. Di nav ringê de dest piyên me bi zinciran girêdayî bûn, lewre jî me nikaribû xwe bîlêbitînin. Leşkeran bi avzûma tîvingê, bi cop û qelasan li me dixistin. Dema em hatin Dîlokê îşkence li wir jî dom kirin. Em birin girtîgehê, rêveberiya girtîgehê got ku em nikarin girtiyên bi vî rengî bistînin. Lewre jî em rakirin qawîşa girtiyan a nexweşxaneyê.

"Di ser û laşê me hemûyan de birînen xedar hebûn, bêyî ku me ji hişê me bibin (narkoz) kêl di-avêtin birînen me. Piştî 3 rojên li nexweşxaneyê, em anîn û avêtin hucreyan. Du rojan em di wir de man. Piştî ku me dest bi greva birçîbûnê kir, em xistin qawîşan."

**Ahmet Sever:** "Di dema êrîşê de ez ji ser hişê xwe çûme. Hestiyên erçena min şikestibû, patereska min teqiyabû. Li Entabê dema em birin nexweşxaneyê bi emeliyatê patereska min girtin. Muhsin Altunê ku wekî min birînxedar bû, bi min re 10 rojan li nexweşxaneyê ma. Piyê wî şikestibû, serê wî pelixîbû, hişê xwe winda kiribû. Hê jî nexweşiyên me didomin. Ez di çihê ku emeliyat bûme de janê dikişînim. Ez û Nusret Yelboğa demekê birin Girtîgeha Erzeromê piştî ku dosya xerâ bû, di sa anîn Girtîgeha Amedê.

Di 17'ê kewçêrê de leşkerên bersûc ez anîm ji bo danişîna dadgehê. Di danişîne de parêzêrê leşker û polîsan hat û ji min re wiha got: "Rojê bûyerê tu li wir bûyî, tiştê ku te dîtiye tuyê bibêjî?" Di danişîne de îfadeye min girtin, piştî ku min îfade da leşker û polisên sivil ku li salonê bûn bi awayekî tehdîtkar li min mêze dikirin. Mehkemê dixwest qatilan paqij nişan bide. Çawa ku me qetlîam pêk anîbe, dihatin ser me. Piştî ku ez ji salonê derxistim, ji hêla polis û leşkeran ve heqaret li min hate kirin. Yek ji wan hat û wiha got: "Tu çawa ji dest filitî, çawa me tu nekuştîye?" Piştî-re jî êrîş anî ser min. Ez bawer nakim ku ji vê dadgehê encameke erênî derkeve, her tişt diyar û eşkere ye, lê di sa me sîwdar nişan didin. Tiştê sosret jî ev bû ku parêzêrê leşker û polîsan Şevket Can Özbey dibêje: "Ji ber li serên girtiyan qaşk tunebûye, lewma ew mirine."

ZEYNEL BAÇIR/ AMED  
Wergêr ji tirkî: Azadiya Welat



Midûr Mehmet Çaçan em tehdît kirin û da zanîn ku ji îro û şûn de hevdîtîne qedexe ye. Hevalê nûner got: "Hewce bi mezinkirina bûyerê nîn e, hevalê me berdîn, bila vegerin qawîşên xwe, îcar hûn dixwazin hevdîtînan qedexe bikin." Mehmet Çaçan "Wê hevalên we li vir bimînin", got. Piştî ku midûrên girtîgehê û sergardiyana çûn, di nav hevalan de em li ser tewra rayedarên girtîgehê axivîn. Kesî îhtîmal nedida ku wê êrîşêke bi vî rengî pêk were. Di serê me de fikrek çêbûbû. Me digot ji ber ku me naxin qawîşan, wê me bibin sewqê.

Lewre jî, ji ber ku hevalan nikaribûn çenteyên me bidine me, cil û bergên me di mezgalan re dane me, me jî li ser hev cil li xwe kirin. Dema ku em di şebekeya navîn de sekinîbûn, sê hevalan em dîtî, neçûn qawîşan û hatin cem me. Hejmarê me bûbû 34 kes. Saet li dora 15:00'an li şaxa ku rêveberiya girtîgehê heye, tevgerek xuya dibû. Kesên nenas û sivil ku me berê qet ew nedîtibûn, li wê derê li me dînihertin. Wê gavê polis û gardiyan ji hêla îdareyê ve, leşker jî ji hêla mitbêxê ve hatin. Di destê wan de

bi cop, hesin û darên bizmarî li serê-hevalan dixistin, ji ber ku ew zehf bûn 4-5 kesan li hevalekî dixistin. Hevalê Ahmet Çelik di çihê de ji ber derbên ku li serê wî ketibûn şehîd ket. Em tev dikişkişandin ber bi qawîşên hevdîtîne. Gelek heval ji ber derbên daran ji xwe çûbûn. Heval li erdê dirêj dikirin, serê wan li betonê dixistin, yê din jî bi qalaz û şivên hesinî li wan dixistin.

Ji mejiyên hevalan xwîn dipijîqî, mejiyên hinekan belav dibû. Hevalên bi navê Rıdvan Buluk, Cemal Çam, Erkan Perişan, Nimet Çakmak û Hakkı Tekin di vê navberê de ji ber ku mejiyên wan belav bû, şehîd ketin. Leşkeran gazî gardiyanan dikirin û digotin: "Ev cehimîn, werin wan bibin." Îşkence û hovitiyên bi vî rengî heta saet 18:00'an de dom kir. Sabri Gümüş û Mehmet Aslan jî di vê navberê de şehîd ketin. Piştî êrîşên midûr û gardiyanan 11 hevalên birîndar birin nexweşxaneyê. Piştî êrîşê ez jî di nav de 14 hevalên birîndar bi lêsiwara (erebeya) ringê kirin û em birin Girtîgeha Dîlokê. Di ringê de ji îşkenceyên giran li me kirin, hevalê me Kadri Demir bi îş-